


Rapora Komxebata Online

ya Diyaloga Civaka Sivîl

19-20 Îlon 2020





İSMAİL
BEŞİKÇİ
VAKFI

Rapora Komxebata Online ya Diyaloga Civaka Sivîl |19-20 Îlon 2020
WEQFA İSMAİL BEŞİKÇİ

Nivîsîna Raporê: Cuma Çiçek
Wergera Kurdî: Cumhur Ölmez
Sererastkirina Tirkî: Cumhur Ölmez
Sererastkirina Kurdî: Şener Özmen
Dizayn: Şener Özmen



Ev rapor bi piştevaniya temsîlkariya Komeleya Friedrich EbertStiftung (FES) hatiye amadekirin. Nezerên di vê raporê da, temsîlkariya FESê ya Tirkîyeyê eleqedar nakin.

Naverok

Pêşekî / 73

Destpêk / 74

Qada Civaka Sivîl Ya Kurd: Kêşe, Çareserî / 76

Diyaloga Civaka Sivîl: Aliyên Xurt û Qels / 79

Zêdetir Xuyakirina Saziyên Civaka Sivîl / 82

Zêdetir Xwegihandina Çavkaniyên Fonan yên Navneteweyî / 85

Pêşvebirina Weşangeriya Civaka Sivîl / 87

Pêşniyazên Tematîk ji bo Diyaloga Civaka Sivîl / 88

Ji Bo Tora Civaka Sivîl Hin Pêşniyaz / 90

Ji bo Sala 2021ê Pêşniyazên Projeyan / 91

PÊVEK 01: Saziyên Beşdar / 93

İBV

İSMAİL
BEŞİKÇİ
VAKFI

Wate
WEŞANXANEYÊ VATEYÎ



TAHİRELÇİ
VAKFI



WEQFA
MEZOPOTAMYAYÊ



SERHOLA
PERFORMANS



AFKIV

DiSA
DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ
ENSTİTUYA DİYARBAKIRÊ BO
LÊKOLİNEH SİYASÎ Û CIVAKÎ
DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH

Türkiye Kültürleri



Artistic & Cultural Re-Solutions



DİJİTAL FEN BİLİMİ VE İNSAN BİLİMİ
DİJİTAL FEN BİLİMİ VE İNSAN BİLİMİ
DİTAM
2010
DİJİTAL FEN BİLİMİ VE İNSAN BİLİMİ
DİJİTAL FEN BİLİMİ VE İNSAN BİLİMİ

Pêşekî *////////////////////*

Em wekî Weqfa İsmail Beşikci, ligel xebatên xwe yên ji roja avabûna xwe û heta îro, xebatên nû jî wekî armanc didin ber xwe yên ku di nava bazîna daxwazên me da diguncin. Di proseya tedbîqa van xebatan da me hewcedarî pê anî ku em kapasîteya xwe ya heyî û struktûra xwe ya sazûmanî raçav bikin. Ligel vê çendê, bi nixandina takekes û saziyên ligel me têkildar, me xwest em bibînin ka em li ser rêyeke çawa dimeşin. Ligel îdraqa kêmasiyên me yên di vê babetê da, me dît ku em xwediyê derdorekê û toreke ragihandinê ne jî ku şiyana wan a bersivdayîna daxwazên me heye. Temas û hevkarîyên ligel takekes û saziyên di nava vê torê da bû hewcedariyek wisa ku xwe zêdetir dide hîskirin.

Ligel SCS û platformên li vir yên ku her yekê ji wan di qadên xwe da karên hêja kirine, di astên cuda da têkiliyên me çêbûn. Ligel hinekan di babetên projeyên hevpar û hevkarîyê da, ligel

hinekan jî di yên piştgirî û piştevanîyê da, em di qadên muşterek da hatin cem hev.

Em dibînin ku diyalog û hevkarîya di navbera SCS û platformên Kurdan da ne di asteke kêrhatî da ye. Tecrûbeyên qîmetdar yên her saziyekê, platformekê hebin jî me dît ku kapasîteya istifadekirina me ya ji hev sinordar e. Ligel wê bawerîyê ku gelek tişt hene em ji hev fêr bibin, em dikevin dewreke wisa ku hewcedariya bi hevkarîyeke zêdetir êdî bivênevê ye. Xebatên ku SCSyêk bi tena serê xwe nikaribe pêk bîne zêdetir dibin, SCSyên di nava hevkarîyê da ne zûtir mezin dibin, hêsantir digihin armancên xwe, qîmet û bandora xebatên derdikevin holê zêdetir dibe. Helbet divê mirov heqê wan xebatên hêja bide yên ku her saziyekê bi ked û dînamîkên xwe pêk anîne.

Em dizanin ku di gelek babetên mîna, sazûmanî, temsîlên di qada netewî û navneteweyî û peyda kirina çavkaniyan da kêmasiyên SCSyên Kurdan hene. Em li wê bawerîyê ne ku em ê bi axaftin, tevger û parvekirinê van kêmasiyan hel bikin. Em wekî weqf beyan dikin ku ji bo her hevkarî û şîrikatiya derbarê vê babetê da em amade ne. Ligel bawerîya ji bo girîngiya zêde ya mayîndebûna vê xebatê, em wisa hizir dikin ku di her serdemê da mazûvaniya saziyeke din dê zêdetir li bejna xebatê bê. Em ji bo Weqfa Frederic Ebert ya ku ji bo pêkhatina vê xebatê piştgirî dayî, Mert Onur û temamiya saziyên beşdar spasîyên pêşkêş dikin.

Li ser navê Lijneya Rêveberîyê ya WîBê
Mükrimê Tepe

Destpêk //////////////////////////////////////

Şîrîkatî û hevkarîya di navbera Aktorên Civaka Sivîl* (ACS) da li Tirkiyeyê ne di aste-ka baş da ye. Ji ber ku di nava cemawera civakî ya sivîl da çanda şîrîkatî û hevkarîyê têra xwe bi pêşve neçûye, kapasîteya birêveberinê daketî ye û dahatên sazûmanî kêmtir in, pêşveçûna di vê mijarê da jî bîzêmet dikeve. Ligel hewla der-beya leşkerî ya 15ê tebaxa 2016an û rêveberîya rewşa awarte (OHAL) ya ku piştî wê du salan berdewam kirî, li Tirkiyeyê di çarçoveya heq û azadiyê da paşdaçûneka zêde çêbû û qada li ber civaka sivîl bi awayekî berbiçav teng bû.

Kêmbûna diyalog û hevkarîya di navbera ACSyan da bû sedem ku torên piştevanîyê têk biçin, çavkaniyên xwebexş baş neyên bikarînan û fîrsendên pêkînanana sînerjîya di navbera xebatan da jî dest biçê. Di hin rewşan da sazîyên ji hev cuda dibe ku heman tişt kiribin. Gelek karên ku potansiyela temamkirina hev di xwe da dihewandin, di asteke lokal da û bi bandoreke sînordar diman. Ev rewş ji bo ACSyan derfeta zanîna û pêşvebirina kapasîteya sazîbûnê sînordar dike. Ji

*Ji ber ku têgiha Saziya Civaka Sivîl (SCS) ne pênaseyek e ku temamiya aktorên li qadê temsîl bike, di vê raporê da Aktorê Civaka Sivîl (ACS) hat tercîhkirin ku ji layê Yekîneya Vekolanên Çandî ya Tirkiyeyê ya Zanîngeha Istanbul Bilgiyê ve hatiye bikaranîn. ACS ji SCSyên enformel wêdetir, pêkhateyên sazûmanî yên enformel û formel yên mîna teşebîsên sivîl, komên civakî, weşanxane, blog û hwd. û aktorên şexsî yên mîna akademîsyen, pêşengên aqilmend û hunermendan jî di nava xwe da dihewîne û bi vî rengî ji bo pênasekirina komeke berfirehtir ya aktorên tê bikaranîn.

wê zêdetir, xebatên tên kirin bi awayekî kartêker nikarin sûde ji potansiyela bihêzkirina qada sivîl û veguhertina civakî wergirin.

Komxebata Diyaloga Civaka Sivîl, di navbera 19-20ê Îlona 2020an da wekî rêze-civînên nivrojane yên online, bi pêşengiya Weqfa Îsmail Beşikçi (WÎB) û bi temsîlkariya Tirkiyeyê ya Friedrich-Ebert-Stiftung hatiye organîzekirin. Ev komxebat, di navbera saziyên civaka sivîl da yên ku li Stenbol, Diyarbekir û derveyî welatî, di qadên ziman, tarîx, çand, huner û edebiyata Kurdî da xebatan dikin, bi rêya bihêzkirina temas, diyalog û muzakereyê, derfetên hînbûna sazîbûnê, pêşvebirina tevkarî û şîrîkatiyên saziyan ji xwe ra dike armanc.

Çar armancên spesîfîk yên komxebatê hene:

1. Di navbera ACSyên li Stenbol, Diyarbekir û derveyî welatî da pêşvebirina diyalog û piştvanîyê; hêzdarkirina tevkarî û şîrîkatiya saziyan,
2. Agahadarkirina saziyên beşdarvan derbarê wan xebatan da yên ku ji aliye saziyên din

ve tên kirin û pêkanîna sînerjiya di navbera xebatên tên kirin û projeyên tên birêvebirin,

3. Pêşvebirina tevkarîyên dualî û pîralî yên di navbera saziyan da, pêkanîna derfeta projeyên hevpar,

4. Bihêzkirina kapasîteya hînbûna saziyan, alîkariya pêşvebirina struktura saziyan ya ku daîmî be li ACSyan.

Ji 11 ACSyên di qadên ziman, tarîx, çand, huner û edebiyata Kurdî da dixebitin, 21 kes tevî komxebatê bûn. Di çarçoveya bernameya komxebatê da, roja ewil bi pêşkêşiyên saziyan hevnasîna di navbera wan da pêk hat. Her ACSyê derbarê rabirdûya xwe, armanc û mebestên xwe, xebatên heta îro kirine, projeyên xwe yên berdewam û planên xwe yên dahatûyê da saziyên beşdarvan agahdar kirin. Di roja duyemîn ya komxebatê da jî nîqaşeke serbest derbarê şîrîkatiyên saziyan û tevkarîyên wan da hate kirin. Di vê çarçoveyê da beşdarvanan derbarê kêşeyên xwe, aliyên xwe yên hêzdar û nehêzdar, astengiyên li ber şîrîkatî û tevkarîyan, firsendên muhtemel, qadên hevpar yên xebatê da fikr û pêşni-

yarên xwe parve kirin. Di nava van nîqaşan da dîsa hewcedariya pêngavên ji bo domdariya diyaloga di navbera ACSyan da û ji bo sala 2021ê tevkariyên projeyên muşexes hatin nirxandin.

Ev rapora li ber destê we guftûgoyên di komxebata navborî da dihewîne. Di çarçoveya raporê da, dîsa kurteyeka danasîna saziyên beşdar tê dayîn. Bi vê xebatê armanc ew e ku nîqaşên hatine kirin bèn tomarkirin û fikr û pêşniyazên derbarê diyalog û tevkariyên di navbera ACSyan da derbasî nivîsê bibin. Armanca xebata navborî ji layenekê ve jî ew e ku yekûneka zanyariyan derbarê diyaloga civaka sivîl da pêk bîne û ji layenê din ve projeya ku wekî pêngaveka ewil e, bi xebatên din bidomîne. Rapor di heman demê da daxwaz dike ku ji bo sala 2021ê di navbera ACSyan da, bingeha tevkariyên muşexes yên projeyan dane.

////////////////////////////////////

Qada Civaka Sivîl Ya Kurd: Kêşe, Çareserî

Shehayên li ber saziyên li ser ziman, tarîx, çand û hunera Kurdî xebatan dikin di heyamên

dawiyê da bi awayekî berbiçav berteng bûne. Sedemê herî muhim yê vê bertengiyê bêşik ew “turbulans” e ya ku havîna 2015an meselaya Kurdî ketiye tê da. Di encama diyalog û muzakeriyên dûvedirêj da kodkirina dubare ya meseleyê ya wekî “ewlehi” û “terorê” û şerên li qadên bajarê belav bûn, bertengiya hem di qada siyasî hem jî ya sivîl da ya ku piştî hewla derbeya leşkerî pêk hatî, tesîreke rasterast li ser ACSyan kirin yên ku di qadên ziman, edebiyat, çand û hunerê da xebat dikirin. Ligel bertengiya ji layenên çawanî û çendaniyê ve pirrengiya di qada civaka sivîl da bi awayekî berbiçav lawaz bû.

Angajmanên di navbera siyaset û civaka sivîl da qadeke berfireh ya kêşeyan pêk tînin. Mîna temamiya Tirkiyeyê li qada Kurdan jî sehaya civaka sivîl bi awayekî giştî di bin sîwana partî û tevgerên siyasî da ye. Ev rewş, pêkhatina civateke avakar-rexneyî û nîqaşeke civakî ya pêşdebir asteng dike û ligel geşedana partî û tevgerên siyasî rê li ber pêşveçûna qada civaka sivîl jî digire. Bo nimûne, têkiliya rakêşanê ya di navbera siyaset û civaka sivîl da, tesîreke neyînî li ser tevlîbûna

kesên xwebexş yan profesyonel bo xebatên civaka sivîl dike. Bi vî rengî, pêkhatina təkiliyeke avakar-rexneyî ya di navbera partî û tevgerên siyasî da, dê hem qada siyasê hem jî qada sivîl berfirehtir bike. ACS bi vê egerê, bi rêya parastina sekna xwe ya xweser û rexneyî, hem dikarin qada civaka sivîl berfirehtir bikin hem jî dikarin zêdetir piştevaniyê bidin veguherîna siyasê.

Yek ji sedemên din ên muhim yê berten-giya di qada civaka sivîl da kêşeyên ekonomîk in yê ku siyasê rasterast tesîrê lê dike. Qada xebatên Kurdî ku jixwe xwediya bazareka sînordar e, di salên dawiyê da ji ber sedemên ekonomîk zêdetir berteng bû. Çunkî bazara ekonomîk ya siyasê rasterast tesîrê lê dike û bazara zimanê Kurdî qewî kesad bû. Ji ber ku xebatên Kurdî di xwe da îtirazekê dihewînin, ji xebatên polîtîk û ji ber vê jî ji siyasê û tiştên di qada siyasê da çêdibin, rasterast miteesir dibe.

Xwendina Kurdî û qada perwerdehî û fêrkariya wê di nava pênc salên dawiyê da bi awayekî berbiçav kêmbûye. Polîtîkayên dewlet û hikûmetê jixwe di vê mijarê da kartêkeriyeke

neyînî pêk tinin. Ligel vê, sekn û tercihên “siyaseta Ortodoks” ya li Kurdistanê serdest yê derbarê mijara reformên ziman û çanda Kurdî da tên kirin, roleke muhim li ser xwe digire ku eleqeya ji bo xebatên Kurdî kêmbibe.

Bo nimûne, beşdarek diyar dike ku; ligel ku kitêbên ji bo dersên hîlbijarte hatin amadekirin bi piştevaniya dewletê derdorê 50.000-100.000an hatin çapkirin, ev xebat wê serdemê ji layê siyaseta Ortodoks ya serdest ve hat boykotkirin; lê îro kitêbên şibî wan yê ji layê weşanxaneyekê ve tên çapkirin di pênc salan da 1.000 jî nayên firotin. Heman beşdar diyar dike ku, sekna boykotê ku encamên neyînî bi xwe ra tîne, li hember reformên mîna Enstîtuyên Zimanên Zindî, beşên lîsansa Kurdî, TRT Kurdî, hêj ji berdewam e û derbarê dersên hîlbijarte yê li dibistanan jî ji bo hemwelatîyan çî xebatên danasîn û teşwîqê îro jî nayên kirin. Li gorî lêkolîneke sehayî ya ku di demeke nêzîk da hatî kirin ji %70yê malbatan ji dersên hîlbijarte ne agahdar in. Lê li wan dibistanên ku perwerdehiya Kurdî ya du saetan lê tê dayîn gelek tişt diguherin.

Seqaya dibistanê cihêtir dibe, derûniya xwendekaran, mamosteyan û civakê bi awayekî pozîtîf vediguhere.

Her wekî beşdar jî diyar dikin, di halê heyî da qismekî zêde yê kitêbên bi Kurdî ji bo “Kitêbxaneya Kurdî” tên çapkirin. Çunkî, ji ber asta zêde kêma ya firotina wan, ji layenê madî ve qadeka xebatê ya domdar dernakeve meydanê. Ligel rewşa ekonomîk ya giştî, atmosfera siyasî ya di qada Kurdan da û tercîhên siyasî rasterast tesîrê li ser xebatên navborî dikin. Xebatên derbarê zimanî da yên ji aliye ACSyên Kurd ve tên kirin gelek caran ji layê civakê ve rastî eleqeyekê nayên, bi piranî wekî “paletiya pûşî” tên dîtin. Her çend di vê mijarê da, di maweyeke kurt da, bi hin jêderên fonan an jî piştgiriyên sponsoran xebatên meşandin jî çareserî ew e ku di maweya dûvedirêj da reformên siyasî yên ku telebên ji bo zimanê Kurdî zêdetir dikin û mobîlîzasyonên di qadeke berfireh ya civakî da pêk bên.

Li vir jî bo çareserîya kêşeyên ligel “siyaseta berteng” ya di wateya mobîlîzasyonê sosyo-polîtîk ya li derdora partiyên siyasî û tev-

geran, di qadên ekonomîk, civakî, çandî, zimanî, mekanî û hwd. da, destnîşankirina ferqeke di navbera “siyaseta berfireh” ya ku wekî mobîlîzasyonêke sosyo-polîtîk ya pirnavendî, piraktori û heterojen xwe dide der, û berêxwedana “siyaseta berfireh” ya bi hewcedariyên civakî ve girêdayî, ji bo ACSyên Kurdan dibe ku derwazeyekî nû veke. Heke ACSyên xweser û rexneyî yên Kurdan diyaloga di navbera xwe da bihêz bikin, tevkarîya xwe şêşve bibin û sekneke hevpar nişan bibin dibe ku ji bo vehugerîneke bi vî awayî mifadar bin. Dîsa bi wateya berfireh ligel pêşveçûnên di siyaseta da, xebatên di warê civaka sivîl da tên kirin hem dibe ku di qada civakî da rastî tewecuheke zêdetir bên, hem jî ji bo xebatan piştgiriyên civakî bi dest bikevin.

Ji bo ku ACS di warê veguherîna civakî da roleke aktîf li ser xwe bigirin di xebatên sazîbûnê da profesyonelbûna wan muhim e. Di nava wan ACSyan da yên ku xebatan li ser Kurdan dikin, di vê mijarê da kêşeyên muhim hene. Pisporbûna di qadên xebatan da, pêkanîna xebatên ku di wî warî da bibin referans, veguherîna saziyeke ku

di qada xwe de bibe referans, divê wekî arman li ber wan bin. Ligel vê, di halê heyî da, tê dîtîn ku di gelek xebatan da profesyonelbûneke bi vî rengî têra xwe pêk nayê. Ev rewş ji aliyekî ve şiyana tesîra ACSyan ya li ser qadên ekonomîk û siyasî û saziyên di van qadan da sînordar dike û ji aliyekê din ve jî bingeha tevkarîya saziyan û şîrîkatiyên wan qels dike. Bi vî awayî, pîsorbûna di xebatên saziyan da ji bo ACSyên di qada xebatên Kurdî da faalîyetan bi rê ve dibin, ezmûneke muhim e.

////////////////////////////////////

Diyaloga Civaka Sivîl: Aliyên Xurt û Qels

Aliyên xurt yên wan ACSyên çalak hene ku di qadên ziman, tarîx, edebiyat, huner û çanda Kurdî da xebatan dikin. Serxwebûna wan a li hemberî partî û komên siyasî û pejirandina wan a nêzîkatiyeke rexneyî, aliyên herî xurt yên wan saziyên çalak pêk tînin. Ev rewş ji aliyê din ve li gorî nezera wan ACSyan yên ku angajmana wan ligel partî û komên siyasî heye, dibe sedemê kêşyan. Saziyên beşdar pesend dikin ku xebatên

wan, -nemaze jî ji ber ku xebatên li ser Kurdan îtîrazekê di xwe da dihewînin- bi awayekî giştî polîtîk in. Ligel vê jî, ew li hemberî partî û komên siyasî xweseriya xwe û sekna xwe ya ku berjewendiya kamûyê bingeh qebûl dike, diparêzin û qîmetê didin vê yekê.

Her çiqas di sehayê da asta veguherîna hewlên berbiçav qels be jî, di nava saziyên navborî da ji bo tevkarî û şîrîkatiyê çandeke eşkere û ji bo vê mijarê jî lêgerînên xurt hene. Serweriya aktorên siyasî ya li ser qada civaka sivîl, kêmbûna ACSyên serbixwe û rexneyî, lêgerînên pêşvebirina tevkarî û pêkanîna şîrîkatiyan ya saziyên bi vî rengî xurttir dike.

Rasthatina qadên xebatan yên saziyên beşdar, an jî potansiyela hevtamkirinê û afirandina sînerjiyê, aliyekî hêzdar ava dike û pencereyeke muhim ya firsendan li ber wan vedike. ACSyên pêwendîdar di qadên cuda cuda yên mîna ziman, tarîx, çand, edebiyat û hunerê da, bi rêbazên cuda yên wekî performans, lêkolînên sehayê û parêzvanîyê, bixebitin jî di esasê xwe da di warê parastina nasnameya Kurdan û vesazkirina

wê da rastî hev tèn û xebatên wan çeperên cuda yên hewcedariyên civakî pêk tînin. Di vî warî da saziyên pêwendîdar dest didin sehayên ciyawaz, bi amraz û metodên ciyawaz kar dikin û torên şexsî û sazûmanî yên ciyawaz pêşve dibin. Ev ciyawazî ji ber ku ji dûriya ji hev zêdetir wesfa temamker li ser xwe digire, potansiyela çêkirina sînerjiyê jî di xwe da dihebîne.

Nebûna reqabeta di navbera ACSyên navborî da û xurtiya nêzikatiya piştevaniyê, firsendekî mezin dide. Ji ber ku di qada Kurdan da hejmara ACSyên ji angajmana siyasî dûr, serbixwe û rexnekar kêr in, di nava van saziyan da ji reqabetê zêdetir têkiliyên girêdayî tevkariyê çêdibin. Bi vî awayî, peywenda ku ew tê da ne, piştgiriya dide ACSyên serbixwe ji bo proseya pêkanîna diyalogê, kirina karên hevpar, parvekirina jêderan û tevkariya wan. Tê ditin ku ACSyên beşdar îzafeten ji tecrûbeyên berê sûd wergirtine û vê yekê jî zemîna tevkariyê qewîtir kiriye.

Ligel meseleyên hevpar yên li jorê hatine diyarkirin, destnîşankirina aliyên hêzdar yên

ACSyan di qadên cuda cuda da, ji bo diyalog û hevkarîyê muhim e. Hinek ACS bi awayekî berfireh xwe digehînin ciwanan û medyaya civakî aktif bi kar tînin, hinek ACS di warê parêzvanîyê da, hinek jî di warên vekolînên qadê û rapor-kirinê da xwediyên kapasîteyê kartêker ya sazûmanî ne. Li aliyekî ACSyên li derveyî welatî di qada navneteweyî da, ji nezera civaka sivîl, medya û partiyên siyasî ve, derbarê parêzvanîyê da dibin xwedî tecrûbeyên muhim û li aliye din ACSyên di qada çand û hunerê da performansan pêk tînin, kartêkeriyên civakî yên xurttir derdixin meydanê. Dîsa, hinek ACS xwediyên kapasîteya avakirina sazûmanî û birêvebirinê, plansaziya heyamên kurt û naverast, bernamesazî, amadekirina projeyan û pêkanîna têkiliyên der-sînori ne û hinekan ji wan jî di warê xebatên Kurmançî-Kirmanckî/Dimilî/Zazakî da tecrûbeyên biqîmet pêk anîne. Neqlkirina dulayenî ya van tecrûbe û pêzanînan, parvekirina çavkaniyên madî, insanî, navend-zanîn an jî sembolîk, dê ji bo bihêzbûna diyaloga di navbera ACSyan da bibe piştevaniyêke xurt.

Bi qasî aliyên wan yên xurt aliyên ACSyan yên qels jî hene ku nayêne piştguhkirin. Di vê mijarê da yekemin keşeya ku beşdarên dubare destnîşan kirî, kêmbûna çavkaniyên ekonomîk yên ACSyan e. Ji xeynî yek du îstîsnayan, bi awayekî giştî derfetên temînkirina çavkaniyên madî ji endam û xwebexşan ji bo ACSyan gelekî sînordar in. Li aliyê din, çavkaniyên fonan yên ku hikûmeta navendî û dewlet rasterast bi rêve dibin û mudaxil dibin ji bo ACSyên ku xebatên derbarê Kurdan da dimeşînin, hima bêje bi temamî li cihekî asê ne. ACSyên tevlî komxebatê bûne kêm be jî dikarin xwe bigehînin fonên navneteweyî. Ligel ku li Tirkiyeyê di kamilbûna demokrasîyê û berterefkirina ihlâlên mafên mirovan da xebatên li ser Kurdan diyarker bin jî, endîşeyên siyasî yên sazîyên ku fonê didin, nêzîkatiya bimesafe ya ji bo ACSyên ku xebatên li ser Kurdan dikin û hin çaran jî zanîna wan a kêm, wekî astengiyên muhim cihê xwe digirin. Ligel vê yeke, di nezera sazîyên ku fonê didin parêzvanî û karên lobiyê, pêşvebirina tîkiliyên sazûmanî, pêşvebirina projeyan û kapasîteya

plankirinê, şîrîkatiyên girêdayî projeyan, temînkirina çavkaniyên derve ji bo ACSyan bi awayekî berbiçav sînordar dikin.

Kêmbûna diyaloga di navbera ACSyên Kurdan yên li Tirkiyeyê, qadeke din ya kêşa û qelsiyê pêk tînin. Hem ACSyên li Diyarbekirê û hem jî yên li Stenbolê ji xeynî çendîn tecrûbeyên sînordar, xebat û projeyên xwe bi piranî bi sere xwe dimeşînin. Hewlên ji bo pêkanîna tevkariyên sazûmanî di asteke gelekî kêma da ne. Di sa, ji xeynî yek du îstîsnayan tîkiliyên di navbera ACSyên Kurdan yên li Iraq, Îran û Sûriyeyê hima bêje nînin.

Kêşeyên li Kurdistanê bandorê li diyasporayê jî dikin. Ligel ku roja îro bi taybet li Ewropayê diyasporayeke muhim ya Kurdan hebe û di berdewamiya salên dûvedirêj da gelek ACSyên Kurdan xebatên xwe bidomînin jî, di vê mijarê da xebatên diyalog û tevkariyê ne di asteke ew qas hêja da ne ku bêne destnîşankirin. Ligel ku li diyasporayê nifûseke muhim ya ciwan heye, ACSyên li wir ji bo xwe-îfadekirina van koman ya di warên ziman, edebiyat, çand û hunerê da

nikarin qad û derfetan ava bikin. Xebatên ji bo ciwanan li zortirê welatan bi qada “bala ya siyasetê” ve sînordar dibe û di vê qadê da dixitime. Bi vî awayî ew kapasîteya ACSyan ya avakirina qadên nû yên ku vê xitimînê berteref bike, nîne û di vî warî da qelsiyêke zêde heye.

Xuyabûna ACSyan hem li raya giştî ya Kurdan, hem li raya giştî ya Tirkiyeyê û hem jî li qada navneteweyî, sînordar e. Di vê mijarê da qelsiyên berbiçav hene. Ji xeynî yek du îstîsnayan, di qada navneteweyî da ACSyên pêwendîdar hima bêje qet ne xuya ne. Gelek ACSyên Kurd di qada navneteweyî da jî bo pêkanîna danasîn, xuyabûn û karên parêzvanîyê ne xwedî çavkanîyên mirovî ne û ev di vê qadê de dibe sedemê kêşeyêke mezin. Li aliye din, xwegihandina raya giştî ya Tirkiyeyê bi awayekî berbiçav berteng bûbe jî tê dîtîn ku derfeten amûr û enstrûmanên heyî bi awayekî kartêker nayên bikaranîn.

Têkiliya navxweyî ya di navbera ACSyên beşdar da jî bi asta “pêzanîneke sethî” sînordar e. Sazî danasîna xebatên xwe baş nakin, amrazên danasînê yên kartêker pêk nayînin, medyaya ci-

vakî baş bi kar nayînin û ev sedemên bingehîn yên derbarê vê mijarê da ne.

Kêmbûna hêza mirovên wesifdar, aliyekî din ê hevpar yê qelsiya ACSyan pêk tîne. Zortirê ACSyan nikarin xwe bigehînin mirovên di qadên xwe da pispor, profesyonel û xwebexş. Ev rewş rasterast bandorê li ser çawanî û çendaniya xebatan dike. Kêşeyên çavkanîyên ekonomîk yên ACSyan, li ber xwegihandina kesên wesifdar yên profesyonel kêşeya herî mezin e. Ligel vê jî ji bo xebatên girêdayî projeyan qîsman ekîbên wesifdar tên avakirin. Li aliye din, jî bo tevlîbûn û piştgiyaya kesên xwebexş û wesifdar ya xebatên sazûmanî, hewcedarî bi pêkanîna baweriyê û çêkirina rêyên dahêner heye.

////////////////////////////////////

Zêdetir Xuyakirina Saziyên Civaka Sivîl

Piştî ku di komxebatê da sînoren peywendîda aktorên civaka sivîl di nav da, kêşeyên derketine meydanê, rêyên çareseriyê û aliyên xurt û qels yên ACSyan yên di nava vê peywendê da hatin nirxandin, qadên kêşeyan yên bingehîn

hatin nîqaşkirin û ji bo çareseriyê jî nezer û pêşniyaz hatin pêşkêşkirin. Xuyabûna sînordar ya di qadên lokal, herêmî, neteweyî û navneteweyî ya ACSyan, ji bo qebûla hevpar ya beşdarên yek ji kêşeyên bingeîn bû.

Ji bo zêdetir xuyakirina ACSyan ya di qada Kurdan da, di nava civaka sivîl ya Tirkiyeyê û di nezera aktorên navneteweyî da, yekemin pêşniyaza derdikeve pêşiyê, bikaranîna çalاک ya medyayê ye. Her wekî teyîtkirina ACSyên di qadê da dixebitin, ev qad nemaze ji bo xwegihandina nifşên ciwan rêya herî kartêker e. Hin saziyên di qadên çandî da xebatan dikin û zêdetir ciwanan di nava xwe da dihewînin, qada medyaya civakî bi awayekî çalاک bi kar tînin. Ligel vê jî, divê gelek ACS zêdetir girîngiyê bidin vê qadê û ji bo xurtkirina kartêkeriya wê veberhênanan bikin.

Hem bihêzkirina kartêkeriya xebatên medyaya civakî hem jî pêkanîna materyalên danasînê ji bo bikaranîna saziyên alternatîf yê mediyayê, dibe ku piştgiriyeke xurt bide xebatên xuyabûnê. Di vê qadê da, di xebatên xuyabûnê da, pêkanîna stratejiyeke ku bi taybetî aliye “dîtbarî” wekî na-

vend qebûl dike, muhim e.

Eger di esasê proseyên agahdarbûna nifşê nû da hebûna aliye “dîtbarî” bê qebûlkirin û ji kaxiz û kitêbê zêdetir bûna wan a “nifşê ekranê” li ber nezerê bê girtin, girîngiya dijîtalbûna berhemana, bikaranîna çalاک ya amûrên navend-dîtbarî yê mîna info-grafik û vîdeoyan, dibe xwedî roleke girîng.

Pêşniyazeke din ya derbarê dîtbariyê da derdikeve pêş, pêşvebirina şîrikatîyên dulibî yan jî pirhejmarî ye. Şîrikatîyên bi vî rengî ji aliyekî ve çavkaniyên sazûmanî zêde dikin û ji aliyê din jî wan rêbaz û amûran curbicur û dewlemendtir dikin yê ku di xebat û projeyan da tên bikaranîn. Dibe ku hem xwegihandina civateke berfirehtir û cuda û hem jî dewlemendkirina rêbaz û amûrên ragihandinê, di xebatên xuyabûnê da ferqekê pêk bînin. Bo nimûne, her wekî beşdarêkî/ê îfade kirî, di pêşangehekê da ku saziyên medyayê hazir bin yê ku di qada medyayê da majorîteyê wekî mijar didin ber xwe û bi ziman û xetên cuda weşanê dikin, pêşkêşkirina performanseke hunerî ya li ser konseptê “majorîteyê”,

dê kartêkerî û xuyabûna çalakiya navborî zêdetir bike. Di vê mijarê da, li şûna ku ACSyek ku di warê medyayê da xebatan dike, xebata navborî bi serê xwe bike û projeyê bi pêşangehekê sînardar bike, tevkarîya ligel komeke şanoyê yan jî ASC-yeke ku xebatên muzîkal dike, dê ferqeke berbiçav pêk bîne.

Daxwaz û hewla ACSyên di qada Kurdî da xebatan dikin, ji bo daxilbûna platformên ku aktorên civaka sivîl ya Tirkiyeyê bi kar tînin, û bikaranîneke çalaktir ya medyaya dîtbarî ya alternatîf, zêde kême. Ligel vê çendê, bi awayekî çalaktir bikaranîna van platformên hevpar û medyaya dîtbarî ya alternatîf, pêkanîna materyalên mîna video û e-bultenên danasînê yên ji bo xebatên sazûmanî, pêşvebirina amrazên nû yên mîna podcastan, dibe ku di xebatên xuyabûnê da ferqeke berbiçav pêk bînin.

Yek ji kêşeyên din ên di daxilbûna civaka sivîl ya Tirkiyeyê da zêde derdikeve meydanê meseleya sansûre ye. Ji bo berterefkirina sansûrên ku hem dibin sedemê sînardarkirina xebatên saziyên bi Kurdan ve eleqedar û hem jî dibin

sedemê kêmxuyakirina wan, wekî stratejiyeke çalak dibe ku “zelalî/aşkeretî” bê pejirandin. Tecrûbeyên ACSyan nişan didin ku, îfşakirina sansûran, parvekirina wan a ligel raya giştî, dane-xuyakirina di nezera civatên berfireh da, kartêker in. Ligel vê çendê, muhim e ku dema li rexekê sansûr tînin îfşakirin û di nezera raya giştî da tînin xuyakirin, divê li rexê din ev rewş nebe sedemê ketina kirasê mexdûriyetê û ji şewezimanê mexdûriyetê dûr bê sekinîn. Çunkî, ev sekna ku berê xwe dide tînkirina aktorî û bûyerê dramatize dike, hem bi awayekî mayînde telafîya jidestdana mafan pêk nayîne, hem jî hêviyeke veguherînê ji bo dahatûyê nade.

Ji bo zêdetir xuyakirina ACSyan, herî dawî divê girîngiya pîr-zimaniyê bê destnîşankirin. Li kêleka Kurdî pêkanîna xebat û projeyan ya bi zimanên mîna Tirkî, Ingilîzî, Almanî, Frensîzî, xwegihandina sazî, dezgeh û komên civakî yên axêverên wî zimanî hêsantir dike. Tecrûbeyên ACSyên hem li derveyî welatî hem jî yên li Tirkiyeyê, di xebatên sazûmanî da, nemaze jî di çalakiyên xuyabûnê da, karîgeriya pîrzimaniyê ya

wekî serekaniyeke muhim nişan dikin. Di vê mijarê da bi taybet bikaranîna Ingilîzî di çalakîyên xuyabûnê da roleke baş pêk tîne.

////////////////////////////////////

Zêdetir Xwegihandina Çavkaniyên Fonan yên Navneteweyî

Her çiqas di mijara xwegihandina çavkaniyên fonên navneteweyî da, di nava saziyên beşdar da hinek sazî zêdetir tecrûbedar xuya bikin jî, bi giştî di vê mijarê da hewcedarî bi geşedaneke heye.

Ji bo zêdetir xwegihandina çavkaniyên fonên navneteweyî, di bin banê ACSyan da gihandina wan kesan muhim e ku bikaribin ji bo van saziyan projeyan amade bikin. Di vê qadê da kêşeyên mezin hene. Ji ber ku derbarê amadekirina perojeyan da hejmara mirovên tecrûbedar kêm e, ji gelek bernameyên hîbeyan nayê îstîfadekirin. Di vê mijarê da, di her ACSyê da dibe ku herî kêm kesek ji bo pêşvebirin û plankirina projeyan bê gihandin. Di vê mijarê da gihandina kesên ku bi piştgiriya kes û saziyên tecrûbedar

alîkariya profesyonel yan xwebexş bidin ACSyan pêşvebirina projeyên taybet û bernameyên perwerdehiyê muhim e. Dîsa, bi taybetî ji sazî û dezgehên ku piştgiriya didin ACSyan derbarê mijara pêşvebirin û birêvebirina projeyan da, daxwaza zêdetir piştgiriya dibe ku çareserkirina kêşeyan hêsantir bike.

Projeyên hevpar yê di navbera ACSyan da dibe ku rêveker bin. Çunkî hevkarîyên bi ser projeyan ra, beriya her tiştî dê bibe sedem ku proseya plankirinê baştir pêk bê. Dîsa, bi qasî plankirinê di proseya pratîkê da jî dê ji bo projeya heyî bibe piştevan ku zêdetir çavkaniyên insanî, ekonomîk, bingeş-zanîn bîn mobilîzekirin. Ev rewş di proseya pratîkê da, dê kontrolkirina dualî, hisapdayîne û zelalîyê zêdetir bike. Sînor-darbûna çavkaniyên fonan, bi proseya pandemiya Covîd-19ê bertengkirina budçeyan ya gelek saziyên xwediyên fonan, di vê qadê da pêkhatina civateke reqabetê ya di navbera ACSyan da, bû sedem ku saziyên ku fonan didin di hîlbijartinên xwe da zêdetir hesas bin. Bi vî awayî, pêşvebirina projeyên ku pala xwe didin xebatên ACSyan

yên ku potansiyela hevtemamkirinê û pêkanîna sînerjiyê di xwe da dihewînin, dibe ku zêdetir derfeta xwegihandina fonan pêk bîne.

Hevkariyên der-sînori yan jî yên herêmî yên di navbera ACSyan da dibe ku derfeta xwegihandina fonan zêdetir bike. Bi taybetî, pêşvebirina hevkarî û serlêdanên hevpar ligel ACSyên li welatên ku saziyên fonan lê hene, li çendîn welatan xebatan birêve dibin û temsîlkarên wan hene, dê fondayîna projeyan hêsantir bikin. Ev hevkarîyên der-sînori û herêmî dîsa ligel xwegihandina çavkaniyên fonan, dê piştgiriyê bide pêkhatina têkilî û torên nû yên sazûmanî jî.

Divê ji bo veguhartina nêrîna negatîf ya li hemberî saziyên Kurdan ya saziyên navneteweyî yên ku fonan didin, xebat bîn kirin. Wextê bi projeyên baş û platformên hevpar serî li van saziyan bê dayîn, hem dibe ku ev îmajê negatîf bê guhertin, hem jî zêdekir çavkanî bêne peydakirin.

Şopandina birêkûpêk ya çavkaniyên fonan û bangewaziyên projeyan û pêş-amadekariyên ji bo van zêde muhim e. Amadekariya ACSyan ya

ji bo bangewaziyên hîbeyan, pêkanîna hewzên projeyan û ji bo her projeyekê pêşvebirina xalên konseptekê, şopandina teqwîmên çavkaniyên fonan, parvekirina agahî û belgeyan ya di vî warî da, dê ji bo bidestxistina çavkaniyên derve bibe sedemê pêkhatina rûdanên zêde bikêrhatî.

Herî dawî, ligel ku li aliyekî lêgerînên ji bo zêdetir bidestxistina fonan berdewam in, li aliyê din ji bo xebatên mayînde û domdar divê li ser pêşvebirina çavkaniyên xwemalî bê sekinin. Parvekirina çavkaniyan û pêkanîna piştevanîyê ya di navbera ACSyên Kurd da, di vê mijarê da dibe ku bibe destpêkeke muhim û ACS kapasîteya birêvebirina xebatan ya bi çavkaniyên xwemalî gelekî mezintir bikin. Ji bo ku xwe ji xebatên bi fonan ve girêdayî azad bikin divê sazî çavkaniyên xwe û derfetên xwe bigihinîn hev. Dîsa, derbarê hilberîn, berbelavkirin û parvekirinê da divê rêbazên zêdetir afirîner bîn kemilandin. Di vê mijarê da vekolandina mînakên serketî dibe ku roleke rêveker pêk bîne.

////////////////////////////////////

Pêşvebirina Weşangeriya Civaka Sivîl

Her wekî li qismê, li ser kêşeyên ACSyên di qada Kurdan da dixebitin, hatî destnîşankirin, xebatên weşangeriyê ji bo gelek ACSyan qadeke muhim ya xebatê pêk tînin. Li vê qada ku malîyet zêde ye, avakirina struktureke domdar ji bo saziyên pêwendîdar azmûneke muhim e. Di vê mijarê da pêşniyaza yekem ya derdikeve pêşiyê dijîtalkirina xebatên weşangeriyê ye. Ji ber ku proseya bidestxistina zanîne yê nîfşên nû zêdetir di qada dijîtal da pêk tînin û wisa tê texmînkirin ku dê di dahatûyê da ev zêdetir bibe, dijîtalkirina xebatên weşangeriyê dibe ku bibe vebijêrkeke muhim ya çareseriyê.

Çunkî, bi destkêşana ji kaxezê, belavkirina berhemên mîna kitêb, kovar, broşûran û hwd. ya di qada dijîtal da, beriya her tiştî dê ragihandina bo zêdetir kesan hêsantir bike. Her wisa, di xalên mîna kaxez, çapxane, belavkirin û xerciyên çavkaniyên mirovî da dê taseruf pêk bê û malîyet jî kêmtir bibe. Di mijara belavkirina di qada dijital

da, hebûna sazî, dezgeh û platformên di mîzana navneteweyî da xizmetê didin, ji bo ACSyan derbaskirina xebatên weşangeriyê bo qada dijital hêsantir dibe. Dîsa, niha di nava saziyên beşdar da dijîtalkirina hin berhemên wan û belavkirina bi ser platformên navneteweyî ra, tecrûbeyên wan ên sazûmanî yê di vê mijarê da û amadebûna wan a parvekirina binesaziyên xwe, ji bo veguherîneke bi vî rengî firsendekî muhim pêşkêş dibe.

Şopandina ji nêzîk ve ya hin hewlên sîvîl ku di qada weşangeriyê da karên baş kirine û modelên resen pêşve birine, pêşniyazeke din a muhim e di vê qadê da. Di deh salên dawiyê da di vê qadê da mînakên baş pêk hatin. Dîsa di heyama pandemiya Covîd-19ê da, di warê dijîtalbûnê da tecrûbeyên resen pêk hatin. Parvekirina tecrûbeyên heyî, şopandina wan a ji nêzîk ve, derbarê weşangeriya ACSyan da potansiyelên rêveker di xwe da dihewîne.

Derbarê weşangeriyê da herî dawiyê şîrîkatiya xebatên belavkirinê hat pêşniyazkirin. Malîyetên belavkirinê di xebatên weşangeriyê da

ji bo ACSyan barekî giran e. Dîsa, saziyên derbarê Kurdan da xebatan dikin, di hin rewşan da, ji ber sedemên siyasî dibe ku rastî kêşeyan bên. Dibe ku ev rewş vebirê bixe karên belavkirinê. Bi vî wayî, tevkarî û şîrîkatiya derbarê belavkirinê da ya di navbera wan ACSyan da yên ku karên weşangeriyê dikin, dê ji bo pêşvebirina karên weşangeriyê bibe piştgiriyeke xurt. Di vê babetê da, pêkanîna platformên hevpar yên belavkirinê, qadên firotina online, yan jî tevkarî û şîrîkatiya temasa ligel torên belavkirinê yên heyî, dibe ku pêk bên.

////////////////////////////////////

Pêşniyazên tematîk ji bo Diyaloga Civaka Sivîl

Yek ji sernavên din ên di komxebatê da hatî nirxandin qadên rasthatina tematîk yên ACSyan e. Wekî pêngaveke ewil ji bo mayîndekirina dîdarê û domandina berfirehkirî ya diyaloga civaka sivîl gelek pêşniyazên tematîk hatin kirin. Li jêrê pêşniyazên derdikevin pêş hene:

1. Ji bo saziyên beşdar xebatên parastin û pêşvebirina nasnameya Kurdî xaleke hevpar e û bersiva xebatên derbarê zimanî da tîn kirin di raya civakê da sist e, lewra divê di xebatên sazûmanî da parastin û pêşvebirina Kurdî bibe temayeke bingehîn. Bi vî awayî, divê xebatên zimanî bibin yek ji temayên esasî yên hevkarî û şîrîkatiyan. Nebûna polîtîkayeka hevpar ya di qada zimanî da bandora xebatên tîne kirin, bi awayekî berbiçav kêr dike. Ligel ku sînoren aktorên siyasî li ber nezerê bê girtin, aktorên siyasî yên ACSyên Kurd ji rexneyê wêdetir, di vê qadê da divê pozîsyoneka wisa li ser xwe bigire ku lîderiyê ji siyasîyê ra bike û polîtîkayeke zimanî ya hevpar pêşve bibe.

2. Di dibistanên dewletê da çalakkirina qadên ji bo bikaranîna Kurdî hatine vekirin, divê bibe armanc, di vê babetê da ji bo zêdetir hişyariya civakî, divê xebatên bîne kirin. Bo nimûne, di serê sala perwerdehî û fêrkariyê da ji bo ku zarok qeydiya xwe ya darsa hîlbijarte ya Kurdî çêbikin, divê ACS ji bo malbatan xebatên hevpar yên danasîn û teşwîqkirinê bikin.

3. Ligel ku li hin welatên Ewropayê, li dibistanên dewletê derfeta fêrkirina Kurdî heye, ji ber nebûna kesên perwerdekar ev derfet baş nayê bikaranîn. Di warê perwerdehiya Kurdî da, ji bo pêşvebirina sermiyana mirovî divê xebat bêne kirin.

4. Divê di qada navneteweyî da zêdetir girîngî bi çalakiyên parêzvaniyê bê dayîn. Di vê qadê da kêşeyên mezin yên sermiyana mirovî yên wan ACSyan hene ku li ser Kurdan xebatan dikin. Ji bo dagirtina valahiya di vê qadê da divê ku ji bo mijara parêzvaniya di qada navneteweyî da xebatên perwerdehiya taybet û amadekariyê bêne kirin.

6. 2023 sala 100emîn ya salvegera Peymana Lozanê ye. Di serî da Swîsreya ku bajarê Lozanê lê ye, dibe ku li gelek welatan derbarê vê mijarê da çalakiyên cûr bi cûr bêne kirin, kêşeyên Kurd tê da ne, di qada navneteweyî da zêdetir bêne xuyakirin.

7. Dibe ku zêdetir girîngî bi wan xebatan bê dayîn yên ku standartên demokratîk yên di navbera Kurdan da pêşve bibin. Ji bo çareseriyê

kêşeyên di vê qadê da dikare ACSyên Kurdan roleke hêsaner li ser xwe bigirin, xebat û modelên nimûne derbixin holê.

8. Di serî da yên li Ewropayê, ji bo beşdariya ciwanên Kurd yên li diasporayê ya ji bo xebatên civaka sivîl dikare bername û projeyên taybet bêne amadekirin. Di qadên mîna ziman, edebiyat, çand û hunerê da dikare derfetên wisa bêne pêşkêşkirin ku ciwan li kêleka nasnameya xwe ya polîtîk nasnameya xwe ya çandî jî pê têr bikin. Xebatên bi vî rengî ji aliyekî ve dikare ragihandina ligel wan ciwanan hêsantir bike yên ku hem Kurdî hem jî ziman/zimanên wî welatî dizanin û beşdariya wan a xebatên civaka sivîl jî dikare pêk bîne; li aliyê din jî dikare piştevaniyê bide pêşvebirina zimanî û çandî ya ciwanên Kurd yên li diasporayê ku zimanê xwe yê dayikê bi giştî ji bîr kirine.

9. Kêmasiyên esasî yên derbarê ACSyan da rasterast tesîrê li gelek xebatan dike. Divê xebatên mîna torên ACSyan li gorî hewcedarî û hêviyên qadê bêne kirin. Di vî warî da ji bo bertekkirina kêmasiyên esasî yên derbarê ACSyan

da dikare vekolînên qadê bêne kirin û hewcedarî, hêvî û pêşniyazên saziyên pêwendîdar bêne tesbîtîkirin. Xebatên derbarê diyaloga ACSyan û çêkirina toran an jî tevkariyên di navbera ACSyan da bi van agahiyên esasî dê zêdetir bandor dar bin.

10. Dikare ew teşebusên taybet bêne vekolan yên ku di qadên mîna weşangerî, parêzvanî, xebatên çand û hunerî, lêkolînên sehayî û raporîkirinê da karên baş kirine, yan jî di mijarên xwegihandina fonên navneteweyî da bûne modelên serketî. Dikare agahî û tecrûbeyê li vir pêk hatî bê vekolan, parvekirin û belavkirin. Ev dikare bi xebatên yek bi yek an jî hevdiîtinên hevpar çêbibe.

////////////////////////////////////

Ji Bo Tora Civaka Sivîl Hin Pêşniyaz

Di komxebatê da bi qasî temayên ku pê “Diyaloga Civaka Sivîl” berdewam bibe, ji bo veguhestin û berfirehkirina hevdiîtinê heyî wekî to-reke mayînde jî, tiştên hewcedar hatin nirxandin. Di vê mijarê da ev pêşniyaz derketin meydanê:

1. Di rewşa heyî da ev platforma bi beşdariya 11 saziyan pêk hatî, dikare berfirehtir bibe. Di vê babetê da di heyameke nêzîk da divê diyalog û hevkarîyên di navbera van saziyan da bêne hêzdarkirin. Di heyameke navîn da, bi beşdariya ACSyên serbixwe yên ji bo nasnameya Kurdî di qadên cuda cuda yên mîna ziman, çand, huner, tarîx û edebiyatê da xebatan dikin, dikare platforma heyî mezintir bibe.

2. Di berfirehkirina tora navborî da ji bo beşdariya ACSyên Kurd yên li Ewropa û Amerîkayê divê girîngiyeke taybet bê dayîn.

3. Bi berfirehkirina hevkarî û şirkatiyên ACSyan yên der-sînori yên di navbera Kurdistan da, dikare diyaloga ACSyan bê hêzdarkirin û berbelavkirin. Di heyameke nêzîk da, bi taybet ACSyên beşdar yên ku temas û diyaloga wan ligel hin ACSyên li Herêma Kurdistanê Iraqê, dikare roleke rêveker pêk bîne.

4. Dikare hevdiîtinên mîna vê di navbera ACSyên li diyasporayê bêne organîzekirin. ACSyên beşdarî komxebatê bûne û li derveyî welatî ne, dikarin pêşengiya van xebatan bikin.

5. Ji bo mayîndekirin, piştevanî û mezin-
kirina diyaloga di navbera ACSyan da festîval/
bîenal an jî fuarên ACSyan yên salane dikarin
bên lidarxistin.

6. Her ACSya beşdar salane herî kêr ji
bo projeyekê, herî kêr jî ligel saziyekê dikare
pêkanîna hevkarîyê wekî prensîbekê qebûl bike û
vê yeke wekî armançekê bide ber xwe.

7. Şirkatî û hevkarîyên di navbera saziyan
da divê tenê bi lijneyên birêvebirinê yan jî bi rê-
veberan ve sînordar nemine. Di navbera ekîbên
projeyan yên ku di bin banê ACSyan da karên
mîna hev dikin û xebatkaran da, divê têkilî û
hevkarî pêk bên.

8. Ji bo mayîndebûna vê hevdîtîne toreke
dikare bê çêkirin. Di serê ewil da ev dikare bi ser
grûbeke e-mailê ra pêk bê. Ligel vê, mîna “Tora
ACSyên Kurd” dikare platformeke mayînde jî bê
avakirin. Di vê babetê da dibe ku vekirina mal-
pereke hevpar jî mumkin be. Avakirina toreke
zêdetir sazûmanî, profesyonel û girtî jî mumkin
e, û yeke sisttir, amatortir û zelaltir jî. Diyarkirina
daxwaz û armançên platformeke wiha, zelalkiri-

na bendewariyên ji wê, dê diyarkirina çawaniya
torê jî hêsantir bike ya dê bê avakirin.

////////////////////////////////////

Ji bo Sala 2021ê Pêşniyazên Projeyan

Di komxebatê da herî dawiyê ji bo 2021ê
hevkarîyên şênber yên projeyan hatin nirxandin
û 3 pêşniyazên projeyan hatin pêşkêşkirin.

1. Projeya Lêkolîna Pêdiviyên û Analîza
Rewşê ya Qada Civaka Sivîl: Ji bo diyarkirina
pêdivî, daxwaz û nêrînên wan ACSyan yên ku
di qada Kurdan da xebatan dikin, dikare proje-
yeke lêkolînên qadê bê birêvebirin. Bi lêkolîneke
bi vî rengî, dê derbarê qadê da dane û agahiyên
esasî bêne bidestxistin û tora civaka sivîl ya berev
pêdivî, daxwaz û pêşniyazan ve pêk bê. Agahi-
yeke wiha esasî dîsa dê plankirina wan xebatan
hêsantir bike yên daxwaza pêkanîna wan tê kirin
û dê derfetê bide pêşvebirina projeyên ku bersivê
didin pêdiviyên. Herî kêr du ACSyên di mijara
lêkolînên qadê û raporkirinê tecrûbedar, dikarin
berpirsiyariya pêşvebirina projeya navborê bigirin
ser xwe.

2. Komxeta Tecrûbeyên Herî Baş yê Civaka Sivîl: Ji bo berdewamiya têkiliyên di navbera saziyên beşdar da û ji bo hêzdarkirina diyalogê, hevdîtîna salane dikare berdewam bibin. Bi vê armancê hevdîtîna 2021ê dikare bi şîara “Tecrûbeyên Herî Baş yê Civaka Sivîl” pêk bê. Di komxebata navborî da derfeta parvekirina bi detay ya projeyên herî baş yê saziyên beşdar dikare bê tedbîqkirin. Komxebateke ku projeyan bi hûrgilî parve bike, bi hewandina jêrenavên mîna pêşvebirina projeyan, plansazî, peydakirina çavkaniyan, proseya tedbîqê, bandorên wê, xebatên şopandin û nirxandinê, dersên hatine tecrûbekirin û hwd. dê derfeta analîz û nirxandîneke berawirdî pêk bîne û di xebatên ACSyan da afirîneriyê pêşve bibe û rê li ber zanîna rê û rêbazên nû veke. Girêdayî ihtimala ku komxebat li Diyarbekirê bê kirin, hat diyarkirin ku Weqfa Mezopotamyayê û Enstîtuya Lêkolînên Civakî û Siyasî ya Diyarbekirê dê mazûvaniya komxebatê bike. Girêdayî ihtimala pêkanîna bi awayê online jî hat diyarkirin ku du ACSyên li diyasporayê dikarin barê komxebatê bigirin ser xwe.

3. Projeya e-Vateyê: Proje, bi şîrîkatiya Weqfa Ismail Beşikçi, Koma Xebatê ya Vateyê û Weşanxaneyê Vateyê dê dijîtalîzekirina hemû hejmarên Kovara Vateyê û pêşkêşkirina wê ya di qadên dijîtal da pêk bîne ya ku di warê Zazakî da bûye referanseke girîng. Ev xebata bi şîrîkatiya Weqfa Ismail Beşikçi, -ku di heyameke nêzik da dijîtalîzekirina “Kovara Kürt Tarihi” wekî aramancekê daye ber xwe û di vî warî da xwediyê tecrûbeyêke muhim ya sazûmanî ye- Koma Xebatê ya Vateyê û Weşanxaneyê Vateyê dê pêk bê, di babeta şîrîkatî, parvekirina çavkanî û tecrûbeyên sazûmanî ya di navbera ACSyên Kurd da dê bibe mînaekeke hêja. Dîsa, di babeta dijîtalîzekirina weşangeriya ACSyan da, dê mînaekeke duyemîn pêk tîne û dê ji bo ACSyên din jî îlhambexş be. Ji hemûyan girîngtîr, ji bo parastîna Zazakiyê ku nisbet bi Kurmancî û Soraniyê jî alîkariyên sazûmanî zêdetir mehrûm e û di bin xetereya windabûna zimanî da ye, dê bibe piştvanîyeke xurt.

PÊVEK 01: Saziyên Beşdar

1. Şermola Performans

2. Komeleya Danasîna Sermiyana İsmet Şerif Vanlı û Perwerdehî, Çand û Pêşvebirina Mafên

Mirovan

3. Enstîtuya Lêkolînên Civakî û Siyasî ya Diyarbekirê (DÎSA)

4. Yekîneya Lêkolînên Çandên Tirkiyeyê ya Zanîngeha Bilgiyê (TÛKAB)

5. Weqfa Mezopotamyayê

6. Koma Xebatê ya Vateyê û Weşanxaneyê Vateyê

7. Weqfa Tahir Elçi ya Mafên Mirovan

8. Weqfa İsmail Beşikçi (WİB)

9. Kargeh-Çareseriyên Çandî û Hunerî

10. Navenda Lêkolînên Civakî ya Dicleyê (DİTAM)

11. Chalak Events





Bi şîrîkatiya avakar ya Mirza Metin û Berfin Zenderlioğluyê, di 17î Cotmeha 2008an da bi navê “Destar Tiyatro” hat avakirin û bi navê “Şermola Performans” berdewamî li rêya xwe kir. Di navbera salên 2008-2010an da wekî komeke gerok produksiyon pêk anîn û tûrneyên dûvedirêj yên Kurdistanê çêkirin. Di sala 2010an da bareke li Stenbolê veguhaste mekanê şanoyê, li vir şeş salan produksiyon hilberandin, derxistin ser sehneyê, perwerdehî û lêkolîn pêk anîn. Di sala 2016an da ji ber sedemên ekonomîk û polîtîk mecbûr ma ku ji cihê derkeve yê ku wekî sehne bi kar dianî, paşê jî wekî komeke gerok berdewamî li rêya xwe kir. Li Stenbolê ji çendîn saziyan xelatên di kategoriyên cuda da stendin, derbarê listikên wê da bi dehan rexne hatin nivîsîn. Di berdewamiya 12 salan da, wek jê listika zarokan 22 produksiyon hilberandin. Li welatî û derveyî welatî tevî festîvalan bû, tûrne li dar xistin û xwe gihande bi hezaran temaşevanan. Di sala 2018an da ji layê Mirza Metin ve li Kölnê ofîsa Şermola Performansê ya Almanyayê hat avakirin. Şermola Performans çalakîyên xwe

girêdayî du navendan, Stenbol û Kölnê bir rêve dibe.

Armancên Avabûnê

- Nivîsîna lîstikên kurdî yê hevçerx, sehnekirina wan û derbaskirina wan a qada navneteweyî;
- Bi vekolandina tradisyona vegêranê ya Mezopotamyayê danîna têkiliya ligel şanoya hevçerx û pêşvebirina şêwazên vegêrana hevçerx;
- Vekolandina babetên aktûel, tarîxî û civakî, raberkirin û parvekirina wan a ligel temaşevanan.
- Pêkanîna vekolîn û perwerdehiyên li ser qadên mîna lîstikvanî, derhênerî, nivîskariya lîstikan,
- Di serî da Stenbol û Köln, li welatî û li derveyî welatî dîdara ligel temaşevanan,

Çi Karên din Dike?

- Projeyên hevkarîyên sazûmanî yê li welatî û derveyî welatî pêk tîne, perwerdehiyan pêşve dibe û tedbîq dike;
- Xeyala avakirina sehneyeke din a li Sten-

bolê dike;

- Xeyala avakirina çewlîgeke şanoyê ya li Kurdistanê dike;
- Wiha fikir dike ku xeyalkirin û hilberandina şanoyê çeperekî muhim yê têkoşîna azadiyê ye.
- Şanoyê di nava sêgoşeyê jîyan, huner û siyasetê da wekî çeperek û şêwazekî estetîk yê têkoşînê dibîne.

Lîstik

2009 Qeşmerên Apoletî (Kurdî)

2009 Palyaçonun Maceraları (Tirkî)

2009 Reşê Şevê (Kurdî) – Lîstikên Hevrûbûnê 1

2010 Cerb (Lîstika Bê Gotin)

2010 Bûka Lekî (Kurdî)

2011 Dîsko 5 No'lu (Kurdî) – Lîstikên Hevrûbûnê 2

2012 Antigone2012 (Kurdî) – Lîstikên Hevrûbûnê 3


2013 Gor (Kurdî)
2014 Merheba (Tirkî-Kurdî) – Lîstikên
Zimanî 1
2015 Çêna Dengizî (Tirkî-Kurdî) – Lîstikên
Zimanî 2
2005 Di Tuwaletê De (Kürtçe) – Lîstikên
Hevrûbûnê 4
2015 Dil Kuşu (Türkçe) – Lîstikên Zimanî 3
2016 Serencama Qjjikan (Kurdî)
2017 Panopticon (Lîstika Bê Gotin)
2017 Balans (Kurdî)

Projeyên Navneteweyî

2017 Rawestgeharaf (Kurdî, Almanî,
Tirkî) – Şermola Performans & fringe ensemble
Bonn 2018 Anziehungskräfte (Almanî) - Şermola
Performans & fringe ensemble Bonn
2019 Acht (Almanî) – Şermola Performans
Almanya
2020 Unvollkommen (Almanî) - Şermola
Performans Almanya
2020 Eksik Semah (Tirkî) - Şermola Performans
Almanya
2020 Ouroboros (Almanî) - Şermola Per-

formans & fringe ensemble Bonn
2020 Min's Monolog (Almanî) - Şermola
Performans Almanya







Fikra avakirina komeleyekê ji bo parastin û danasîna koleksiyona rewşenbîr, tarîxzan û dîplomatê Kurd Îsmet Şerif Vanlı, ya ku ji kitêb, name, arşiv û destxetan pêktê, digihe sala 2017ê. Jacqueline Samalie-Lambelet û Ayoub Barzanî ji tevli nîqaşên di navbera Îsmet Şerif Vanlı û Îhsan Kurt da bûn û di 11ê Nîsana 2008ê Komeleya Pêşvebirina Mîrasa Kurdan ya Îsmet Şerif Vanlı hat damezirandin. Bi peymanê di navbera Îsmet Şerif Vanlı û Kantona Vaud (BCU Lozan) da, koleksiyona navborî daxilî Kitêbxaneyê Kanton û Zankoya Lozanê (Bibliothèque cantonale universitaire vaudoise - BCU Lausanne) bû û ji bo îstifadekirina cemawerê hat pêşkêşkirin ku yek ji mezintirîn kirêbxaneyê Swîsrê ye. Armanca sereka ya komeleyê koleksiyona ku ji layê Îsmet Şerif Vanlı ve di berdewamiya salên dirêj da hatî berhevkerin û ji nêzîkî 3500 berhemên ji heşt zimanên cuda pêk tê, bi rêya BCU Lozan, ku yek ji dewlemendtirîn kitêbxaneyên Swîsrê ye, bêne parastin, danasîna wan bê kirin û ji bo îstifadekirinê amade bin.

Soirée de la littérature kurde



Avec Suzan Samanci

Nouvelliste, romancière et poète kurde. Auteure de plusieurs ouvrages, publiés en kurde et turc et traduits en français et en allemand. Elle a rédigé des chroniques pour les journaux turcs et kurdes «Demokrasî», «Gündem», «Özgür Politika» et «Taraf». Elle vit depuis plus de 10 ans entre Diyarbakir et Genève.

- Lecture de ses livres en kurde et en français par l'auteure
- Visite guidée de la Bibliothèque interculturelle
- Apéro: spécialités kurdes et vaudoises

En présence de:

- M. Jean-François Clément, le syndic de Renens
- Mme Karine Clerc, Conseillère municipale, Renens
- M. Ihsan Kurt, Président d'AFKIV

Vendredi 9 octobre 2020 à 17h00

GLOBLIVRES

Bibliothèque interculturelle
Rue Neuve 2bis
1020 Renens



Association pour la promotion
du Fonds Kurde Ismet Chérif Vanly
et le développement de l'éducation,
de la culture et des droits de l'homme



Contact: 079 465 33 68
Organisation: AFKIV, GLOBLIVRES, avec le soutien de la CISE

Armancên Sazûmanî

Saziya me ku di sala 2019ê da navê xwe wekî “Komeleya Mîratê Kurdan, Pêşketin, Perwerdehî, Çand û Mafên Mirovan ya Îsmet Şerif Vanlî” (Association pour la promotion du fonds Kurde Ismet Chérif Vanly, le développement, l'éducation, la culture et des droits humains - AFKIV) guhert, bi rêya lêkolîn, konferans, nîqaş û çalakiyên medyayê û yên çandî yên di raya giştî da, dixwaze mîrata Kurdî ya Îsmet Şerif Vanlî biparêze û pêşve bibe; û dixwaze tevkarîyê di pêşveçûna Kurdistanê ya çandî, perwerdeyî û demokratîk da bike. Yek ji armancên sereke yê komeleyê pêkanîna hesasiyeta raya giştî ya Swîsreyê ye ji bo meseleya Kurdan.

Çalakiyên Din

Komeleya me ji sala 2018ê û vir ve ligel “Komeleya Ali Baba û Hûn” (Association Ali Baba and You), bi awayekî bi rêk û pêk, di hem-bêza siruştê da çalakiyên çandî, hunerî, û ekolojîk li dar dixê. Ev çalakiyên cejnê bi giştî li maleke çiyayî yan jî li Alpên Vaudois, li stargehekê,

li dora şîara “Çiyayên Hevkariya ligel Zarokan” pêk tên. Nêzîkî sed kes tevli vê mîtingê dibin ku bi piranî li derdora agirî, bi civateke germ, bi muzîka Kurdî û govendê çêdibin. Ev roj, ji bo piştgiyariya projeyê perwerdehiyê tîndarxistinê ku armanca wê ya bûrsdayîne heye ji bo zarokên xizan yên li Kurdistanê. Gerên surîştê û listikên ji bo zarokan jî perçeyek ji bernameyê ne.

Panel/Sempozyum/ Konferans

2018 Efrîn, di bin bombeyan da bijî,
2016 Çareseriya demokratîk ya Meselaya Kurdan çi ye?

2016 Li Rojhilata Navîn şer û aşî: Ji bo meseleya Kurdan kîjan çareseriyên demokratîk?

2016 Li Swîsreyê koça Kurdan: Di navbera sirgûn û entekrasyonê da

2013 Derbarê 90emîn salvegera Peymana

1923 ya Lozanê da

2012 Sûriye: Dahatûya kêmineyên li Sûriyeyê

Şirikên me



BUREAU CANTONAL POUR
L'INTÉGRATION DES ÉTRANGERS ET LA
PRÉVENTION DU RACISME (BCI)



Bûrsa Perwerdehiyê ya İsmet Şerif Vanlı

Em li wê baweriyê ne ku têkoşîna li hem-ber xizaniyê ya ku ji ber newekhevî û rewşa nedemokratîk peyda dibe, hewcedariyê bi parvekirineke adilane ya sermiyanê welatî tîne. Bi vê şîarê em dibêjin ku hewcedarî bi tedbîrên bergiriyê heye. Bi vê niyetê û bi baweriyê ku qismê herî qels û di heman demê da ji bo pêşveçûn û hêzdarîyê herî gunvac zarok in, em wekî komele, ji bo tedbîqa mirata İsmet Şerif Vanlı em piştgiyê didin perwerdehiya zarokan. Bi çavkaniyên ku di vî warî da tîndarî bidestxistin, em bi hevkarîya ligel Weqfa İsmail Beşikçi ji bo zarokên xizan bûrsa perwerdehiyê didin.

İsmet Şerif Vanlı
Eğitim Bursu


Son başvuru tarihi: 10.07.2020 - 18.00
Burs başvuru formu ve şartlara sitemizden ulaşabilirsiniz.

Bûrsa Perwerdeyê ya
İsmet Şerîf Wanlî

Dema dawî ya serlêdanê:
10.07.2020 - 18.00
Ji bo forma serlêdanê û şertên serlêdanê hûn dikarin serdana malpera me bikin.

www.ismailbesikciyakfi.org



DIYARBAKIR KADIN SÖYLEŞİLERİ-1

İttifak, Dayanışma ve Çelişki Kavramları
Işığında Türkiye'de Kadın/Feminist Hareketler



İclal Ayşe KÜÇÜKKIRCA

6 Nisan 2019 - 14.00
DTSO

HEINRICH
BÖLL
STIFTUNG
DERNEĞİ
TÜRKİYE
TEMSİLCİLİ



DİSA Barış Okulu
katılımcılarını arıyor.

ÇATIŞMA ÇÖZÜMÜ VE TOPLUMSAL BARIŞ İNŞASINDA STK'LARIN ROLÜ

Seminer dizisine katılmak için
disa@disa.org.tr adresine niyet mektubuyla
birlikte başvuru yapınız. Son başvuru tarihi 3
Eylül 2019'dur. Katılım durumunuz 5 Eylül
2019 tarihinde size bildirilecektir.

SEMINER TARİHLERİ:
7, 14, 21, 28 EYLÜL 2019

İletişim için Atalay Cöçere disa@disa.org.tr adresinden ve
0555 3371834 no'lu telefondan ulaşabilirsiniz.

FRIEDRICH
EBERT
STIFTUNG

TÜRKİYE SİYASETİNİ YENİDEN DÜŞÜNMEK

Tanel Demirel
Türkiye Siyasetinin "Sağ" Hali

Tarih: 9 Kasım 2019, Cumartesi
Saat: 13:00
Yer: Diyarbakır Mimarlar Odası
Adres: Yaşar Kemal Cad. Kalender Plaza
Kat:6 No:10 Yenişehir

DİSA
FRIEDRICH
EBERT
STIFTUNG



**DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL
ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ**


**ENSTİTUYA DIYARBEKİRÊ BO
LÊKOLÎNÊN SİYASÎ Û CIVAKÎ**

**DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL
AND SOCIAL RESEARCH**

Enstîtuya Lêkolînên Siyasî û Civakî ya Diyarbekirê (DİSA), wekî enstîtuyeke ji siyasetê azad û piranîger, di 8ê Adara 2010ê da li Diyarbekirê hat avakirin. DİSA armanc dike ku li qadên ku bi bernameyên lêkolînan ve pêwendîdar in, ji bo lêkolîneran bibe navendek, bi lêkolînên ku rê li ber pêşveçûnên civakê yên sosyal û siyasî vedikin, ji bo pêkanîna politikayên berev dahatûyê ve, piştevaniyeke rasterast, objektif û pala xwe bide xebatên qadê û navend-zanist, pêk bîne. DİSA, bi daxwaza pêşketina hesasiyeta civakî ya wekhevî-parêz ku derfetê dide pêkvejiyîna ciyawazîyan ya bi aştîyane û xurtbûna diyalogê, lêkolînan dike û raberî eleqemendan dike; bi konferans, sempozyûm, panel, komxebat, atolye û raporên piştevaniyê dide parvekirina agahiyan.

Bernameyên Lêkolînan

1. Bernameya Lêkolînê ya Zimanê Dayikê û Pedagojiyê
2. Bernameya Lêkolînê ya Sazkirina Dadmendî û Aştîyê



Diyarbakır Siyasal ve Sosyal Araştırmalar Enstitüsü (DISA), Adalet ve Barış İnşası Araştırma Programı kapsamında başlattığı "Çatışma Çözümü ve Barış İnşası: Dünya Deneyimleri Serisi" projesi kapsamında çalışmak üzere genç araştırmacılar arıyor.

Başvuru Belgeleri
Adayların aşağıdaki üç belgeyi içeren proje başvuru dosyalarını en geç **12 Temmuz 2020** tarihine kadar disa@disa.org.tr adresine göndermeleri gerekmektedir.
- Özgeçmiş (CV)
- Daha önce yayınlanmış makale/rapor örneği
- Araştırma teklifi (Maksimum 2 sayfa olması önerilen teklif şu öğeleri içermelidir: Önerilen vaka, vakanın önemi, Türkiye' de çatışma çözümü ve barış inşası çalışmalarına olası katkıları)

DISA
Diyarbakır Siyasal ve Sosyal Araştırmalar Enstitüsü
KURTULUŞ YOLU 11/1
DİYARBAKIR 71000

Detaylar için: <https://disa.org.tr/2020/06/26/disa-genc-arastirmacilar-ariyor/>

2019/DİSA SÖYLEŞİLERİ-6

MEHMET BAYRAK

ŞARK İSLAHAT PLANI VE GÜNÜMÜZDE KÜRT SORUNU

Yurda gelen yeni vatandaşlar
Elkızda 2453 göçmen yerleştiriliyor

Şarkta iskân mıntaka
Ankara 20 — İskân üdürü Ali Galip bey yer

TARİH: 3 EKİM 2019, CUMARTESİ
YER: DİYARBAKIR MENARLAR OCAĞI
SAAT: 15:00
ADRES: YAĞAR NEMAL CAD.
KALENDER PLAZA KAT: 9/10/19

3. Bernameya Lêkolînê ya ji bo Diyarbekirê Jiyan û Mekanên Mayînde

4. Bernameya Lêkolînê ya ji bo Diyarbekirê Wekheviya Zayendî ya Civakî

Xebatên DiSAyê

Hevpeyvîn û civîn

2019 Hevpeyvînên DISAyê

2019 Ji bo Diyarbekirê Xwendinên li ser

Jinan û Hevpeyvîn

2019 Hevdîtinên SCSyên Diyarbekirê

2017 Rêze-Civînên Xwendin/Analîzê yên di çarçoveya politikayên Bajarvaniyê da

2016 Zindikirina Proseyên Aştiyê yên ku sekinin.

Semîner û Bernameyên

Perwerdehiyê

2019 Dibistana Aştiyê

2018 Bernameya Semîneran ya Rêbazên Lêkolînên Bajarvaniyê

2016 Bernameya Semîneran ya Modelên Perwerdehiya Alernatîf yên ji bo Pêş-Dibistanê

Panêl

2019 Rêze-Panêlên Jinûve-fikirîna Siyasetê Tirkiyeyê

2017 Panêla Avahîsaziya Hevkariyê

2016 Panêla di plansaziya Bajarvaniyê da Politikayên Beşdariyê

Çalakiyên Psîko-Sosyal û Çandî

2018 Şanoya bi Kurdî ya Kûklayê

2017 Xebata Piştevaniyê ya Psîko-Sosyal ji bo Zarokên di jêrbandora Şerê Sûrê da mayî

2017 Pêşangeha Avahîsaziya Hevkariyê

Weşan û Lêkolînên DiSAyê

Bernameya Lêkolîna Zimanê Dayikê û Pedagojiyê

2010 Birîna Zimanî/ Kêşeyên girêdayî bi-karneanîna Kurdî ya di perwerdehiyê da

2012 Rêze-Belavoka Ewîl Zimanê Dayikê

2012 Modelên ku Xwendekarên Kurd bi-karin di Perwerdehiyê da bi kar bînin.

2014 Di Heman Malê da Zimanên Cuda/veguhêziya zimanî ya di navbera nifşan da

2015 Dengê Bakur/ bi Edebiya Zarokan
ya Devkî ber bi Perwerdehiya Pêş-Dibistanê
2015 Seta Gulgulîskên Zarokan
2016 Ji bo Seta Perwerdehiyê Rêbera
Perwerdekaran
2018 Serederiya ligel Travmayên Zarokan/
Di Proseya Şerî da Alîkariya Psîko-Sosyal
Bernameya Sazkirina Dadmendî û Aştiyê
2013 Ji Berê Heya Îro li Tirkiyeyê Pergala
Cerdevaniyê
2013 Têgihiştinên Derbarê Çareseriya
Meseleya Kurdan da, Aktor û Prose (ligel HB-
SDyê)
2015 Tiştêk Jî Ne li Cihê Xwe Ye: Piştî
Proseya Şerî Daxwazên Dadmendî û Rûbirû-
mayîna ligel Rabirdûyê
2018 Di bin Sîwana Tecrûbeyên Navne-
teweyî da Lêgeriyên Aştiyê li Tirkiyeyê
2019 Mekanên Aştiyê

Bernameya Lêkolînê ya Jiyan û Mekanên Mayînde ji bo Diyarbekirê

2018 Fikrîna Sûrê ya bi ser Mekanê Malê ra

2019 Nêrîna bo Diyarbekirê ya bi ser Du-
bendiya Xizmet û Siyasetê ra: Tecrûbeyê Şareda-
riya Bajarê Mezin ya Diyarbekirê

Bernameya Lêkolînê ya Wekheviya Zayenda Civakî ji bo Diyarbekirê

2018 Di bin Sîwana Têgehên Yekîtî, Na-
kokî û Hevkariyê da Têvgerên Jin/Femînîst yên
Tirkiyeyê
2019 Jin, Jinanî, Li Diyarbekirê Jinbûn



А Д Ы Г Э Э З А
К У К В І А Н С І
Ғ І Ј З Л О Л І
У

BİR DİLİN PEŞİNDE

90'LARDAN GÜNÜMÜZE KÜLTÜREL ALANDAKİ ANADİL MÜCADELESİ

LAZULİKİ
HAMŞENTSNAG

23 MAYIS - 17 HAZİRAN 2019

ANA DESTEKÇİ

KATKILARIYLA

**FRIEDRICH
EBERT**
STIFTUNG



Istanbul
Bilgi Üniversitesi
LAUREATE INTERNATIONAL UNIVERSITIES



ACIK
TOPLUM
VAKFI

Consulate General of Sweden
Istanbul
İsveç
Sverige

obianet
DAGIŞIK İLETİŞİM A.Ş.

KARŞI
SANAT ÇALIŞMALARı

Türkiye Kültürleri

Koma Lêkolînê ya Çandên Tirkiyeyê, bi teşebusa Endamê Hîndekariyê yê Beşa Tarîxê yê Zanîngeha İstanbul Bilgiyê Prof. Dr. Bülent Bilmezî, ji sala 2013ê û vir ve, ji wan akademîsyenan pêk tê yên ku li ser çandên cuda xebatan dikin û di bin banê Zanîngeha İstanbul Bilgiyê tîn cem hev. Di bin banê Zanîngeha İstanbul Bilgiyê, ji 2013ê û vir ve, bi xêra çalakiyên yekîneyên xebatan, derbarê çandên li Tirkiyeyê yekûneka biqîmet pêk hatiye. Xebatên ku bi avabûna Yekîneya Xebatên Kurdolojiyê ya Bilgiyê despê kirî, bi avabûna Yekîneya Xebatên Civatên Elewiyan (ALTO), Yekîneya Xebatên Civatên Yahûdiyan (YATOÇ), Yekîneya Xebatên Çerkezan (BİLGİ ÇERKEZ), û Yekîneya Xebatên Lazan (LAZURİ) dewam kir; bi vî rengî, bi civîna akademîsyenên ciwan yên ku li ser çandên cuda yên Tirkiyeyê xebatan dikin, zemîneke guncav pêk hat.

Xurtkirina Têkiliya di Navbera

Aktorên Akademî û Civaka

Sivîl da

Koma Lêkolînê ya Çandên Tirkiyeyê ji bo

'Dil Hakları İzleme, Belgeleme ve Raporlama Hazırlık Çalışması: Metodolojik ve Kavramsal Çerçeve' Projesi Başlıyor!



Türkiye Kültürleri

Türkiye'de Kültürel Çoğulluk Platformu Oluşturma Projesi Başlıyor!



Türkiye Kültürleri

bihêzkirina təkiliya di navbera aktorên civaka sivil û akademiye da, ji meha Nîsana 2017ê û pê da, bi piştgirîya Konsolxaneyê Swîsreyê, Weqfa Açık Toplumê, Friedrich Ebert Stiftung, Friedrich Naumann û Zanîngeha İstanbul Bilgiyê, projeyên curbicur bi rêve dibe. Armanca van projeyan ew e ku, piştevanîyê bide xebatên derbarê pirçandî/piranîgeriyê, lêkolîn û saziyên xwêser yên derveyî akademiye yên derbarê komên ziman û bawerîyan yên li Tirkîyeyê xebatan dikin û pêwendîdanîna ligel akademiye û piştevanîya helkîrîna kêşeya kompartmanbûnê (derneketina ji nava dînamîkên koma xwe, nedîtina pratîkên yên din) ye.

Projeya Bihêzkirina Aktorên Civaka Sivil û Pêşvebirina Kapasîteyê ya Pircureyîya Çandî ya li Stenbolê

Ji ber ku derbarê veşartin û bikaranîna daneyên ji layê aktorên civaka sivil ve hatine komkirin yên ku li ser komên çandî xebatan

dikin, kêmasiya agahiyan heye, daneyên hatine berhevkerin bêkêr dibin, derbarê şopandina rêbazan da nezelaliya agahiyan çêdibe û çavkaniyên bingehîn peyda nabin, îstîfadekirina ji mafên mirovan nayê zanîn û agahdarbûna ji qanûnan têrê nake, bikaranîna ekîpmanê baş nayê zanîn, alîkariya daîmî ya ji derve dibe sedemê barekî madî, ji bo çareserkirina gelek kêşeyên bi vî rengî bingehîn bernameya perwerdehiyê hatiye amadekirin. Ji bo çareserîya van kêşeyan modûleke perwerdehiyê hatiye amadekirin û hatiye tedbîqkirin. Ji bo wan aktorên civaka sivil yên ku di babeta pircureyî/zorîneparêziya çandî da temsîkar in û lêkolînan dikin, di bin sernavên wekî; çarçoveya teorîk-têgehî, metodoloji, arşiv-dokûmantasyon û mafên çandî û parêzvanîyê da, ders hatine pêşkêşkirin û bernameya yek-mehî ya perwerdehiyê hatiye amadekirin. Ji bo beşdarên ku dixwazin berdewamiyê li xebatên xwe bikin, bi rêberîya perwerdekar/mentorên serdema sê mehane ya perwerdehiya qadê pêk hatiye, xebatên k udi proseya projeye da hatine bidestxistin bi çalakîyên mîna malperên înternetê,

‘Dil Hakları İzleme, Belgeleme ve Raporlama Hazırlık Çalışması: Metodolojik ve Kavramsal Çerçeve’ Projesi Başlıyor!



Türkiye Kültürleri

şahî û pêşengehan hatine nişandan. Ev proje bi hîlbijartina Stenbolê ya wekî bajarê ceribandîne hatiye tedbîqkirin.

Projeya Perwerdehiyê ya ji bo Lêkolînerên Xweser yên pîranîgerîya Çandî li Tirkîyeyê û Saziyên Civaka Sivîl

Bi vê projeyê, pêşvebirina civata diyalogê ya di navbera aktorên komên çandî da û mekanîzmayên mayînde yên hevkarîyê, bi xêra agahdarkirina derbarê pîrcureyî/zorîneyîya çandî da, ji bo babeta cudakarî û wekhevîyê, pêşvebirina hesesiyetê hatiye hêvîkirin. Bi projeya ku bi tecrûbeya ji Stenbolê ya ku wekî ceribandînekê bû, hatî dizaynkirin, naveroka perwerdehiyê hatiye bipêşxistin û tedbîqkirin, di bin sîwana vê bernameyê da li temamiya Tirkîyeyê ji bo beşdarên ku xebatên komên çandî kirine, dibistaneke havînê hatiye amadekirin, malpera ligel çandên Tirkîyeyê pêwendîdar (<https://www.turkiyekulturleri.org/tr/>) hatiye sazîkirin û derbarê têkoşîna mafê zimanê dayîkê da ya li Tirkîyeyê,

pêşangehek hatiye çêkirin.

Projeya Sazkirina Platforma pîranîyê ya Çandên Tirkîyeyê (2020-2021)

Armanca sereke ya Projeya Sazkirina Platforma Pranîyê ya Çandî, ya bi yarmetiya Konsolxaneyê Stenbolê ya Swêdê pêk hatî ew e ku, torekê ji bo wan aktorên ava bike yên ku xebatan li ser pîrcureyîya çandî û komên çandî yên li Tirkîyeyê dikin. Bi vê projeya navborî, ligel piştewaniya jiyana bihevre ya çandên cuda, ji bo diyaloga di navbera aktorên civaka sivîl da, parvekirina agahiyan, sazîkirina platformeke hevpar ya ji bo şîrîkatî û hevkarîyan, dê xebateke domdar û baş bê birêvebirin. Platforma mayînde ya ku bi têgihîştina beşdarîyê derdikeve holê, ligel komên cuda yên çandî, ji bo derbaskirina kompartîmanbûna di navbera aktorên civaka sivîl û lêkolînerên wan da tîn dîtin, qeşbûna meylên dîkekirina muhtemel û ji bo berterefkirina çalakiyên girtî û bertengiyên ji jiyane peyda dibin, dê bibe piştewan.





Weqfa Mezopotamyayê di sala 2013ê da, ji bo avakirina zanîngehekê li Diyarbekirê hat damezirandin ku Kurdî di serî da, bi zimanên li herême perwerdehiyê bide. Weqfa me ya ku di atmosfereke qismen baş da hatî damezirandin, bi xirabûna rewşa polîtîk, zêdetir berê xwe da xebatên binesaziyê. Weqfa me ya ku bi nezereke taybet berê xwe dide standarbûna zimanî û xebatên termînolojiya qadên cuda, heta îro gelek kar û komxebat pêk anîne. Encamên xebatên xwe jî bi weşanxaneya di bin banê xwe da, neşr dike.

Xebatên Folklorê Kurdan

Xebatên folklorê heta îro bi destê takekes û saziyên cuda hatine kirin. Bi armanca komkirina van xebatên hatine kirin, tesnîfkirin û arşîvkirina wan, di bin banê weqfê da Beşa Xebatên Folklorê Kurdî hat damezirandin. Du weşanên me yên peryodîk hene yên ku xebatên di qadên folklorê Kurdî û zimannasiya wê da diweşîne. Folklorê Me kovareke sê mehane ye ku cih dide xebatên ji layê weqfê ve tîr birêvebirin û heta niha şeş hejmarên wê hatine çapkirin. Folklor û



Ziman, kovareke bi temamî Kurdî ye, tê da zêdetir xebatên teorîk yê di qadên folklor û zimanansiyê da tîn weşandin. Kovare bihekem û akademîk e û cih dide makaleyên bi hemû zaraveyên Kurdî. Yekemîn hejmarê kovara ku şeş mehan carekê tê weşandin, Nîsana 2020ê derket.

Xebatên Standardîzasyona Kurdî Kurdî

Ligel ku zaraveya Kurmancî ya Kurdî xwe-diyê zimanekî nivîskî ye, hewcedarî bi xebatên berfireh yê rastnivîsê heye ji bo ku standartên zimanê nivîskî bêne diyarkirin. Weqf, ligel armanca çêkirina projeyên derbarê standartbûna zimanê nivîskî yê Kurmancî da, ji xwe ra sê xebat wekî armancên sereke diyar kirin.

Rêbera Rastnivîsê: Weqfê ji bo Rêbera Rastnivîsê heft komxebatên navneteweyî pêk anîn û xebata xwe temam kir. Ev xebat di sala 2019ê da hat weşandin û ligel raya giştî hat parvekirin.

Ferhenga Rastnivîsê: Ji bo amadekirina Ferhenga Rastnivîsê, em ligel 61 kesên xwebexş

varyantên peyvên yê ji 61 devokên Kurdî berhev dikin. Lijneya me navneteweyî ya ji 20 kesan pêk tê, di wextên peryodîk da dicive, diyar dike ka gelo kîjan varyantên peyvên hatine berhevkerin ji bo bikaranîna zimanê nivîskî guncavtir e. Ji bo vê xebatê heta niha pênc komxebat hatine birêvebirin ku her yekê çar rojan berderwam kir.

Ferfengên Termînolojiyê yê Derbarê Qadên Cuda yê Zanistê da: Ji bo tespîtkirin û standarkirina têgihên qada hiqûqê yê bi Kurdî xebata hevpar ya weqfa me û Baroya Diyarbekirê çar salan dewam kir. 4 jê navneteweyî, di encama 22 komxebatan da, ev xebat ligel raya giştî hat parvekirin.

Ji bo bidestxistina termînolojiyêke standard ya perwerdehiya zimanê Kurdî, xebata derbarê gramer û têgihên sereke yê zimannasiyê da ya ku di sala 2015ê da dest pê kiribû, ji bo çapê tê amadekirin. Ji bo tespîtkirin û standarkirina têgihên bingeîn yê qada tenduristiyê yê bi Kurdî, xebata ku di bin banê weqfa me da tê birêvebirin û ji komisyona ji doktor û zimanzan pêk tê, berdewam e.



WEQFA MEZOPOTAMYAYÊ






Kursa Çanda Devkî û Berhevkarîya Berhemên Folklorê


(Dersên Metodolojî û Rêbazên Berhevkarîya Folklorê)

Di bin banê weqfê da dîsa ji bo qadên xebatê panêl, sempozyûm, konferans tên amadekirin. Dîsa di bin banê weqfê da ji bo xebatên folklorê, gramera Kurdî, hîndekariya Kurdî, kurs, atölye û perwerdehî tên lidarxistin.

Çend nivîskarên ku bi zaraveya Kurdî ya Kirmanckî/Zazakî dinivîsandin, di sala 1996ê da li Stockholm paytexta Swêdê bi navê Grûba Xebatê ya Vateyê komek avakirin. Armanca vê komê, standarkirin û modernîzekirina Kirmanckî bû. Di vê çarçoveyê da komê ji bo rastnivîs qadêyên rastnivîsê yê Kirmanckî xebat kirin. Dîsa di qadên wekî sinema, siyaset û birêveberîyê da tigêh çêkirin û ferhengeke ji van têgihan weşand. Koma Vateyê li ser qadêyên rastnivîsê xebitî û bi navê Rastnuştîşê Kirmanckî kitêbek çap kir.







Kovara Vateyê

Kovara Vateyê, çeqê weşanê yê Grûba Xebatê ya Vateyê ye. Grûba Xebatê ya Vateyê encamên xebatên xwe yên derbarê standarkirinê da di Kovara Vateyê da diweşîne. Di kovarê da metnên modern yên edebî yên mîna helbest û çîrok; berhevkarîyên folklorik yên mîna çîrçîrok, metelok, gotinên pêşyan, biwêj; makaleyên zîmannasiyê yên ku tê da babetên mîna rastnivîs û gramerê tên nîqaşkirin; nivîsên çandî yên mîna, bîranîn, biyografi, roportaf, dîn, tarîx û coxrafayê, li gorî standartên Grûba Xebatê ya Vateyê tên redaktekirin û weşandin. Kovara Vateyê ya ku ji sala 1997ê û vir ve 64 hejmarên wê derketine, kovara herî temendirêj e ya ku bi Kirmanckî weşanê dike. Bi vî awayî hem di lîteratura Kirmanckî da arşîveke muhim pêk hat û hem jî kovar ji bo îstîfadekirina zimannas û edebiyatvanên li ser Kirmanckî dixebitin bû yek ji çavkaniyên sereke.



Weşanxaneya Vateyê,

Weşanxaneya Vateyê, wekî berdewamiya Grûba Xebatê ya Vateyê bi armanca tedbîqkirina

politikaya weşanê ya vê komê û girêdayî van qai-deyan ji bo çapkirina kitêbên Kirmanckî, di sala 2003ê da li Stenbolê hat avakirin. Kovara Vateyê ji hejmara 21ê û vir ve di bin banê vê weşanxaneyê da derdikeve. Weşanxaneya Vateyê heta evro 120 kitêb çab kirin. Weşanxaneya Vateyê ligel xebatên li ser Kirmanciyê, xebatên polîtîk, sosyolojik û akademîk yên derbarê qada Kurdan da jî çap kirin.

Xebatên Din

Grûba Xebatê ya Vateyê û Weşanxaneya Vateyê ligel xebatên rasterast yên li ser Kirmanckiyê, piştgiriya dide wan sazî û dezgehan jî yên ku li ser Kirmanckiyê xebatan dikin. Ji yekdestkirina xebatên li ser Kirmanckiyê ya di bin banê koma xebatê û weşanxaneyê da û pêkanîna tehekûmekê wêdetir, berbelavbûna van xebatan ya di qada xebatên Kurdî da û bi rêya aktorên pêwendîdar zêdebûna wan diparêze. Di vê babetê da ligel sazîyên cuda yên Kurdan xebatan bi rêve dibe.









TAHİR ELÇİ VAKFI

Weqfa Mafên Mirovan ya Tahir Elçi, di 19ê Kanûna Paşîn a 2019ê karên sazîbûna xwe ya fermî tamam kir û di 13ê Nisana 2019ê da dest bi çalakiyên xwe kir. Weqfa me ya kul i Diyarbekirê ava bûyî, ligel çalakiyên mafên mirovan û hiqûqa mafên mirovan, hewl dide ku çalakiyên civakî, çandî, edebî, huberî û zanistî jî bi rêve bibe.

Weqfa Mafên Mirovan ya Tahir Elçi, li mîrateya Tahir Elçi ya ji bo têkoşîna mafên mirovan, lêgerîna dadmendiye, têkoşîna ji bo aştiya civakî û wekheviya takekesan, xwedî derdikeve. Mafên mirovan û qaîdeyên eslî yên hiqûqê ji xwe ra dike rêber. Li hemebrî her cure tundîyê ye. Bêyî ku berê xwe bide fail û mexdûrên wê li hemberî hemû îxlalên berê yên mafên mirovan disekine. Têkoşîne ligel cezaneditina failên van rewşan dike. Pêşvebirina çanda aştiyê û xweşbînîya civakî ji xwe ra dike armanc.

Kırık Saat

Kırık Saat, kovara çand, edebiyat û fikriyatê, di Mijdara 2019ê bi yekem hejmara xwe



dest bi weşanê kir. Hejmara kovarê ya duyemîn di Sibata 2020ê da derket û hejmara sêyemîn dê di demeke nêzîk da derkeve. Roboski Dava

Doza Roboskîyê

Doza Roboskîyê, aliyê hiqûqî yê Komkujiya Roboskîyê bi hûrgiliya berî biçûk ve vedikole ku bi stendina mafê jiyane yê 34 kesane bi dayî hatibû. Ev xebata Hilmi Şeker, li aliyekî binpêkirinên mafan yê li Tirkîyeyê dinirxîne, û li aliyê din jî rê li ber muhakemeya ligel Doza Roboskîyê ya piralî vedike.

Proje

Projeya Perwerdehiyê ya Peymana Mafên Mirovan ya Ewropayê

Ligel akademiya mafên mirovan ya di bin banê weqfa me da û bi piştgiriya Konsolxaneyê Tirkîyeyê ya Komara Federal ya Almanayê, derbarê serilêdana şexsî ya ji bo Dadgeha Makeqanûnê û Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê, ji bo pêvebirina kapasîteya parêzer û parêzerên stajyer, ji semînerên Online yê

perwerdehiyê pêk tê.

Projeya betalkirina ruxsetan ya di hewama OHALê da


Di çarçoveya projeyê da ku ji aliyê Yekîtiya Ewropayê ve piştgirî dîtiye û dê ji layê weqfa me ve bê birêvebirin, bi raporeke li ser wan parêzeran yê ku ruxset nestendine û ruxsetên wan hatine betalkirin, isbatkirina binpêkirinên mafan û ji bo telafîkirina wan binpêkirinan jî derxistina nexşerêyekê tê daxwazkirin.

Derwaze

Derwaze kovareke bihekem û akademîk e ku di warên zanistên civakî û insanî da têne weşandin. Armanca Derwazeyê ew e ku di disibîlînên cuda da ji bo edebiyatê, Kurdî, wergerê û xebatên akademîk platformekê pêşkêş bike. Derwaze bi piştevaniya Weqfa Tahir Elçî tê belavkirin.

Meseleya Kurdan

Kitêbeke ji axaftinên paneleke li Diyarbe-



kirê ye ya ku bi serenavê “Meseleya Kurdan” pêk hatî.

Panel

Tevgera Heqdariyê ya Kurdan û Tahir Elçi,
Mijdara 2019ê
Meseleya Kurdan, Berfanbara 2019ê

Xebatên Sosyal

Di çarçoveya xebatên sosyal yê wêqfa me da, li herêma Sûrê du caran xebatên alîkariya sosyal hat kirin. Di xebata alîkariya sosyal ya di sala 2019ê da ji bo 445 malbatan alîkariya paketa erzaqî hat kirin. Di xebata 2020ê da ji ji bo 90 malbatan paketa malzemeyên paqijiyê, hat dayîn.





Kovara Kürt Tarihi

Kovara Kürt Tarihi ya ku di sala 2012ê da dest bi weşanê kirî, di sala 2017ê da, bi hejmara 28emîn, di bin banê weqfa me da tê weşandin û niha hejmara wê ya 41emîn hat weşandin.

Çalakiyên Wî Byê yên Terasê

Weqfa Ismail Beşikçi, ji bo saziyên civaka sivil yê ku di qadên din da xebatan dikin û feydeyê wan di mafên mirovan û demokrasi da heye, ji bo odayên pîşeyan, înisîyatîf û takekesan yarmetiyê mekanî dide.

Projeyên ku Berdewam dikin

- Projeya Sêwiran û Nûjenkirina Malpera Webê
- Projeya Akademiya Payîzê
- Projeya Şopandin û Raporkirina Azadiya Akademîk ya li Tirkiyeyê
- Projeya Diyaloga SCSyan
- Projeya Mala Çavdêriya Akademîk
- Projeya Pêşvebirina Kapasîteyê
- Projeya e-Kovar ya kovara Kürt Tarihi

Me ligel berhemên Îsmail Beşikçi, gelek kitêbên li ser tarîx, erdnîgarî û civaka Kurdan hatine nivîsîn, raberî xwînerên xwe kirin.







Kargeh ya ku xweser û ji daxwaza kapîtalê azade, bi teşebusa hunermendê hevçerx û nivîskar Şener Özmen, kurator, rexnegirê hunerê Engin Sustam û aktîvistê Kurd Bilal Ata Aktaş yê ku li Ewropayê dijî, di Nîsana 2019ê da li Paris û Berlînê wekî dîdareke hunerî û çandî hat avakirin. Kargeh daxwaz dike ku hem ji bo kêşeyên hilberîna hunerî û çandî yên qada Kurdî, hem ji bo wan kêşeyan yên ku hunermend pê ra rûbirû dimînin, rêyên çareseriyê peyda bike. Ligel vê, bi perspektîfeke dekolonyal fikirîna li ser ihtimalên nû yên di navbera têkiliyan da, hilberîn û pêşvebirina wan, pêkanîna projeyên çandî û hunerî û arşivkirina pratîkên hunerî yên qada Kurdî, ji xwe ra dike armanc.

Bienala Venedîkê

Ji bo hêzdarkirina têkiliya qada Kurdî ya ligel sehneya navneteweyî û ji bo hêzdarkirina hesasiyeta hunerî û pêşkêşkirina yekem performansê Kargeh-Artê, di meha Cotmehê da li Pepe Lidoyê, ligel hunermendên Kurd, di Pêşangeha Hunerî ya Navneteweyî ya 58emîn Bîenala

KÜRT ALANINDA SANAT ÇALIŞMALARI VE DEKOLONYAL PERSPEKTİF

SANAT VE KAVRAMSAL ETKİLEŞİMLER 1

1: Kürt Alanında Sanat Çalışmaları ve Dekolonyal Estetik



Moderatör:

Bilal Ata Aktaş

Engin Sustam

Tarih: 9 Ekim 2020
Saat: 18.00

www.ismailbesicivakfi.org

IBV

ibesicivakfi
f ismailBesicivakfi
@ismailbesicivakfi

KAR
GEH

KÜRT ALANINDA SANAT ÇALIŞMALARI VE DEKOLONYAL PERSPEKTİF

SANAT VE KAVRAMSAL ETKİLEŞİMLER 1

2: Günümüzde Kürt Sanatçılar: İssızlık ve Alan



Mahmut Celayir

Tarih: 23 Ekim 2020
Saat: 18.00

www.ismailbesicivakfi.org



Moderatör:
Şener Özmen

Deniz Aktaş

IBV

ibesicivakfi
f ismailBesicivakfi
@ismailbesicivakfi

KAR
GEH

Hunerî ya Venedîk 2019ê da ya bi serenavê “May You Live in Interesting Times” (Bi hêviya ku di zemanên ecêb da bijî!), cihê xwe girt.

Komeleya Kargehê bi vê xebatê û bi rêya hunera hevçerx armanc dike ku di navbera qada Kurdî û Venedîkê da têkiliyên hunerî û navneteweyî pêk bîne. Komele, daxwaz dike ku hunermendên Kurd bi temaya “Zemanên Ecêb” tevlî çalakîyên hunerî bibin yên ku di çarçoveya Bienala Hunerî ya Venedîkê da pêk tînin. Di vê serdema post-totalîter ya dinyayê da, hunermendên Kurd jî dixwazin mîna wan kesên li Rojhilata Navîn dijîn û ji ber şer û pevçûnan tûşî koçberiyê bûne, mudaxil bibin.

Bi rêya têgihên “Zemanên Ecêb” û “re-solution” (çareseriyên jinûve), proje daxwaz dike ku ji bo hunermendên Kurd derfetê pêk bîne da ku beşdarî çalakîyên hunerî yên Bienala Venedîkê ya 2019ê bibin. Di serdema globalî û totalîteriyê da, serpêhatiyên Kurdan yên li Rojhilata Navîn yên ji ber şerî û paşê ji koçberiyê, temaya zemanên dijber, bi temaya “zemanên ecêb” ve pêwendîdar dike û çareseriyên jinûve yên seîf-determînasyonê hilberîna hunermendên ji qada Kurdî nişan

dide ya ku ji projeya civakeke azad îlhamê digire, derfetan zêde dike.

Derbarê Dahatûyê da

Komeleya Kargehê, di proseya îstîşare û hevkarîya mayînde ya ligel aktorên çandî da, di qada Kurdî da, di babeta hilberîna hunerî ya jiyane da, ji bo pêşvebirina projeyên çalaktir micid e. Kargeh, bi rêya navbeynkariya hunerî ya di navbera hunermend, aktör û temaşevan da, daxwaz dike ku şert û mercên guncav ji bo danûstendina di navbera çandan da pêk bîne. Komele, hizir dike ku bi rêya hunera hevçerx, sinema û performansên çandî yên ji qada Kurdî, pêşangeh, festîval û atolyeyan çêbike. Bi çalakîyên bi vî rengî, di navbera hunermendên Kurd û yên navneteweyî da têkiliyên hunerî pêk bîne û çanda mînor ya miletekî bêdewlet parve bike, danûstendinê pêk bîne û ragehîne. Kargeh dixwaze wekî xetê der-sînorî kar bike û di navbera yekaneyan da ragihandinên çandî û hunerî pêk bîne. Ne tenê sehaya hunerî ya qada Kurdî ya veşartî mayî, di heman demê da dixwaze

ze çanda mînor ya civakeke bêdewlet ya di bin
zordestiya polîtîk da jî keşf bike û di serdema
globaliyê da hunera kurdî bide xuyakirin.





EŞİTLİKÇİ VE ÇOĞULCU DEMOKRASİ AĞI





Navenda Lêkolînên Civakî ya Dicleyê (DÎTAM), di 01.06.2010ê da, wekî saziyeke navend-Diyarbakir hat avakirin. Avakarên wê, ji kesên wekî akademîsyen, karsaz, doktor, rojnameger, parlementerên berê û hwd. pêk tê.

DÎTAM, armanc dike ku, di serî da ji bo Diyarbakirê, bi rêya pisporên qadên xwe, derbarê babetên ekonomîk, civakî û siyasî da lêkolînan bike, rewşa heyî zelal bike û bi xêra van agahiyan zorê bide saziyên pêwendîdar û tevkariyê di çareseriyê kêşeyan da bike.

Tora Aştiya Civakî

DÎTAM di heyamên dawiyê da zêdetir xebatên “Tora Aştiya Civakî” bi rêve dibe. Armanca “Tora Aştiya Civakî” ya ji layê DÎTAMê ve hatî avakirin, di çarçoveya sê projeyên cuda da yên ku di navbera salên 2016-2019an da hatine birêvebirin, hebûna xwe pêk bîne, tevkariyê bide pêşveçûna demokrasiya li Tirkîyeyê, û di çareseriyê Meseleya Kurdan da rola civaka sîvil zêdetir bike. Bi vê daxwazê odayên pişeyan, SCSyan, pêkhatyên sîvil, aktîvîst û platformên sîvil bîne cem hev û torekê ava bike.

TOPLUMSAL BARIŞ AĞI

EŞİTLİKÇİ VE ÇOĞULCU DEMOKRASİ AĞI PROJESİ
EGALITARIAN AND PLURALIST DEMOCRACY NETWORK PROJECT
01.02.2016 - 31.07.2017



DİCLE TOPLUMSAL ARAŞTIRMALAR MERKEZİ
DICLE SOCIAL RESEARCH CENTER
NAVENDA LÊKOLÎNÊN CIVAKÎ YA DİCLE
www.ditam.org.tr



DIYARBAKIR İLİ SUR İLÇESİ'NDE YERİNDEN EDİLEN AİLELERİN
TEMEL HAKLARA VE KAMU HİZMETLERİNE ERİŞİMİ PROJESİ
PROJEYA GİHANİYA MAFÊN BİNGEHİN G XİZMETÊN FERMÎ BO MALBATÊN
KU JI NAVÇEYA SÜRÊ YA BAJARÊ AMEDÊ HATINE DERÇİKİRIN
CAPACITY BUILDING IN DITAM IN ORDER TO EMPOWER THE
INTERNALLY DISPLACED PEOPLE OF SUR TO ACCESS RIGHTS AND SERVICES



Dicle Toplumsal Araştırmalar Merkezi
Navenda Lêkolînên Civakî ya Dicle
Dicle Social Research Center



Dicle Toplumsal Araştırmalar Merkezi
Dicle Social Research Center
Navenda Lêkolînên Civakî ya Dicle

TOPLUMSAL BARIŞIN İNŞASINDA SİVİL TOPLUM ÖRGÜTLERİ'NİN ROLÜ: GÜNEY AFRİKA DENEYİMİ

THE ROLE OF NGO'S
IN THE BUILDING OF SOCIAL PEACE:
SOUTH AFRICA EXPERIENCE

25.05.2019 - DIYARBAKIR

Di çarçoveya projeya ewil da, di wê civînê da ya ku 1ê cotmeha 2016ê li Diyarberê pêk hatî, “Tora Aştiya Civakî” hat avakirin û metnê deklaryona torê hat weşandin. DİTAMê di bin banê “Tora Aştiya Civakî” da li bajarên cuda yên Tirkiyeyê sazîyên civaka sivil anîn cem hev û heya niha 15 civîn pêk anîn.

Hevkariya Derveyî Sînorî

Heyeta DİTAMê ligel Enstîtuya Lêkonînên Rojhilata Navîn (MERI) ya ku li Erbilê karên xwe bi rêve dibe, di 6î Sibata 2017ê da du civînên cuda pêk anîn. Ji bo geşbûna hevkarîya di navbera her du sazîyan da û ji bo çekirina projeyên hevpar, di komxebatan da projeyên hevpar yên ku sazî pêk bînin hatin nirxandin û bi taybetî jî derbarê xurtkirina têkiliyên di navbera Kurdan û destpêkirina proseyan diyalogê da nêrîneke hevpar pêk hat.

Projeyên Temambûyî

2011 Kêşeya Zimanî di Tenduristiyê da:
Projeya Mînanka Diyarbekirê

2011 Karîgeriya Teşwîq û Krediyên ya li ser Pêşveçûna Mehelî û Herêmî: Mînaka Diyarbekirê

2013 Diyalogên Tîgrîsê-Konferansên Lêgerîna Proseya Aştiyê-1: Axêverê Mêhvan Selahattin Demirtaş, Hevserokê HDPyê

2014 Diyalogên Tîgrîsê-Konferansên Lêgerîna Proseya Aştiyê-2: Axêverê Mêhvan Kemal Kılıçdaroğlu, Serokê Giştî yê CHPyê

2013-4 Meşrûbûna Civakî ya Zewacên Pêşwext: Projeya Xebateke Wesfî

2015-7 Projeya Platforma Demokrasiya Wekhevîxwaz û Zorîneparêz

2017-8 Projeya Pêşvebirina Tora Aştiyê ya Civakî

2018 Projeya Xwegihandina Mafên Bîngehîn û Xizmetên Kamûyê ya Wan Malbatan Ku Li Sûra Diyarberê ji Cihên Xwe hatin Veqetandin.

2019 Projeya Pêşvebirina Tora Aştiya Civakî



ACMOS

Comitato Beni Confiscati Libera Piemonte

FONDATION INSTITUT KURDE DE PARIS

comitato Salva gente

Chalok events

Cultura Sconfinate - Curda Beşinor
Kurdischer Exilfestival Festival

Culture Sconfinate

Un festival di espressione

TORINO
10, 11, 12, 13 APRILE

la cultura curda raccontata dalle voci dei suoi protagonisti

- Concerti
- Chiacchiere
- Proiezioni cinematografiche
- Laboratori
- Incontri



Chalak Events platformeke xweser e ku di Îlona 2017ê da li Stenbolê, ji layê komeke xwendekaran ve hatiye avakirin. Ji bo didara wan kesan yê ku eleqeyê nîşanî çand û hunera Kurdî didin çalakiyên hunerî û çandî li dar dixê. Bi heman armancê di Berfanbara 2017ê da li Wanê jî Chalak Events hat avakirin. Clahak, peyva “çalak” ya Kurdî destnîşan dike, Events jî di Ingilîziyê da wateya çalakê dide. Em wekî Chalak Events van herdu konseptan digihînin hev û em dixwazin nifşên nû yê Kurdî ligel ruhîyeta zamanî watedar bikin. Çumkî, em dizanin ku Kurdayetî ne tenya ew tişt e ku pala xwe bide mezin û pêşyan, di heman demê da tê wateya silavdayîna bo evro jî.

Chalak Events Çi dike?

Kursan, atolyeyan û pêşandanên filman li dar dixê, ger û geştan û meşên bajarî organize dike. Platformek wisa ye ku ji bo veguherîn û pêşveçûnê amade ye. Bi xwarinên taştê û pêşbirkên werzîşê wê derfetê pêk tene ku jin û mêrên ciwan bi hev ra keyfe bikin.



SPOKEN WORD KURDÎ VI

The stage is yours,
do whatever you want!

Mêvan:
Ercan Bingöl
Têma: Jazz & Blues

Dixwazî bixavî? Fermo,
were, dilê xwe rihet bike!

📅 06.05.2018 - Yekşem / Sunday

🕒 20.00 - 23:00

📍 Micasa Teras, Şehit Muhtar Mah.
Mis Sk. 26/4 **Beyoğlu**



SPOKEN WORD KURDÎ VII

The stage is yours,
do whatever you want!

Mêvan:
Krîstîn Ozbey & Sîdar
Mijar: Mîzah, Helbest & Rock

Dixwazî bixavî? Fermo,
were, dilê xwe rihet bike!

📅 03.07.2018 - Sêşem / Tuesday

🕒 20.00 - 23:00

📍 Micasa Teras, Şehit Muhtar Mah.
Mis Sk. 26/4 **Beyoğlu**



Ji bo hunermendên Kurd çalakîyên mîna konser, nîmayîş û rojên înzeyê organize dîke û ji bo temsîlkirina wan a hunera kurdî ya li warekî mîna Stenbolê xerîb, qadên hunerî pêşkêş dîke.

Ji bo dîdara Kurdan ya ligel rabirdû û çanda xwe ya bi rêya zimanî, çalakîyên mîna jivanên xwendinê, panel, gotûbêj, pêşangeh, atolye, ger û geştan amade dîke.

Hewl dide qadekê li ber wan kesên kêmdêrfet

Çalakîyên Chalak Eventsê Sêva Mêxekrêj

Li gorî kevneşopa Kurdan wextê kesek aşiq dibe û nikare eşqa xwe vebêje, sêvekê bi qerênfilê dixemlîne û wekî temsîla hezkirina xwe dide hezkirîya xwe. Chalak Events bi atolyeyan vê çanda windabûyî derbasî nîfşên nû dîke.

Dengbêj Nights

Chalak Events li kêleka çalakîyên keyfe qîmetê dide çanda kevneşop. Ji bo berdwamiya çanda dengbêjiyê ya ku di nava çanda Kurdî da cihekî xwe yê muhim heye, çalakîyên Dengbêj

Nights tên amadekirin. Heya niha li Stenbol û Wanê sê çalaki hatin lidarxistin.

Spoken Word Kurdî

“Spoken Word” ku çalakîya mikrofonta serbest e, lig elek cihên cihanê tê lidarxistin û Spoken Word bi Kurdî cara ewil ji layê Chalak Eventsê ve pêk hat. Heya niha li Stenbolê 6 û li Wanê jî 2 dîdar pêk hatin.

Reze-pêşangeh

Chalak Evensa ku girîngiya resim û peykerê dizane reze-pêşangehan organize dîke. Bi rêya kirina xebatên hunerî yê di qadên cuda da piştewaniyê dide pêveçûna huner Kurdî.

Li festîvala çar rojan ya li Torînoya Îtalyayê çanda Kurdî bi çalakîyên cuda hat pêşkêşkirin. Festîvala ligel Chalak Eventsê, ji layê Acmos, Retrò Scenayê, Comitato Salvagente û Enstîtuya Kurdî ya Parîsê hatî amadekirin, di çarçoveya çalakîyên “Bêsînorîya Çandî” da pêk hat. Ji 10ê zêdetir hunermend û nivîskarên Kurd tevî festîvalê bûn.



Çalakiyên me yên din

- Erasmus
- Atolyeya Şanoyê
- Kurdish Camping
- Rêze-Semîner û Panel
- Ger û geştên li Bajarî
- Çalakiyên Cejna Zimanê Kurdî
- Weşanên Zindî û Performans

Ji bo bîranîna Nesrîn Şêrwanê
For memory of Nesrin Sheerwan

Dengbêj Nights III



Mêvan / Guests:
Cemalê Mihê
Dengbêj Kurdê
Avdîlayê Goyî
Henîfa Şîrnexî

22.12.2018
20:00
0545 640 5246

Bilet - Ticket
₺ 30

Şa Performans (Şehit Muhtar Mah. Nane Sk. No:5 K:2, Beyoğlu - İstanbul)



